# Welatê Me

ROJNAMEYA HEFTEYÎ SAL: 1 HEJMAR: 21 9 AVRÊL 1995 BUHA:40.000 TL(KDVD)


# ARTÊŞA TIRK GUNDÊN BAŞÛR DIŞEWITÎNE

● Di heftiya sêyemîn a îşgalkirina başûrê Kurdistanê de hêzên artêşa tirk berê xwe dan gelê Başûr ê ku reaksiyon nîşanî îşgalê dide. Di heftiya dawî de leşkerên tirk heft şivan bi awayekî hovane qetil kirin.

● Di deh rojên dawî de nêzîkî 51 gundên Zaxo û Duhokê ji hêla hêzên dewleta tirk ve bi darê zorê hatin valakirin. Yên li dijî valakirina gundan derdikevin, têne îşkencekirin, revandin û kuştin. Artêşa tirk wan kesan bi alîgiriya PKK'ê sûcdar dike û qetil dike.

Rûpel 2



## Kurdî û Ehmedê Xanî

Ehmedê Xanî ne bi salekê, wê her dem ji aliyê gelê kurd ve bê bibîranîn. Careke din xuya dike ku mirov bi eslê xwe ser bilind dibe. Ne bi mandîlekirina eslê xwe. Divê em vê jî bizanibin ku kesê nivîskar incex bi zimanê xwe dibe rewşenbîr an na wê bibin rewşenbîrên sexte.

Rûpel 11

## Qereçarşema serê zîpan

Li gorî baweriya vê efsaneyê, Şahmaran di Qereçarşema pêşîn de diçe mala bavê xwe zehiyê. Zehîtiya wê jî salê carek e. Di vê çarşemê de divê kes li hev nexin, dilê hev nehêlin û rika xwe nedine hev. Nexwe heta sala din wê çaxê, wê ew rewşa wan a neyartiyê bidome.

Rûpel 13

## Evîna Remo û Eyşê û karê pembû

Sobeya tenekeyî sincirîbû. Bêhna agirê dara berûyî di odeyê de belav dibû. Eyşê di bin şewqa lembeya melûlî de destmalek dineqişand. Reng û şiklê evîna ku ji dilê wê dihat xwe berdida ser etamînê spîçolkî. Diya Eyşê, serê neviyê xwe danîbû ser kaba xwe, ji aliyekî ve jî çîroka Mirze Mihemed digot.

Rûpel 12

## Artêş nikare çapemenî dikuje

Li gorî agahiyên rojnameya International Herald Tribunê, artêşa tirk ji ber bêhelîkopterbûn û nebûna cebilxaneyê operasyona xwe ya li Dêrsimê daye sekinandin.

Rûpel 10


## Rojnameyeke nû dengekî dijber

**Xwedî-îmtiyazê Rojnameya nû Necati Taniyan li ser derketin û siyaseta rojnameyê pirsên me bersivandin**

● Em diçin û tên rastî polîtîkaya red û înkarê ya 75 salan tên. Ji bo ku ji vê red û înkarê gel bê filitîn, di binê pêşengiya gelê kurd ê bira de, xebatek heye. Em dixwazin vê tevgera azadiyê bi mirovan bidine nasîn. Divê em wan pê serwext bikin. Xebat mîna bûyereke terorê tê navandin.

● Pratîka rojnameyên dijber li ber çavan e. Ji rojnameya Tanê heta bi Özgür Ülkeyê. Niha jî em derdikevin. Em dev ji xeta xwe ya dijber bernadin û em bibiryar in. Em dizanin ku wê dijwarî û tengasiyên me çêbibin. Em bi destûran naxebitin û rojnamevantiyê nakin.

Rûpel 8-9



## Kızılaya tirk bûye şaxekî MİT'ê

● Li gorî çavkaniyên herêma Başûr tîmên taybet û endamên MİT'a tirk bi kincên wezîfedarên Kızılayê dikevin nav gundên Başûr, ajantiyê dikin, bi siwareyên vê rêxistinê çek û sîleha dibin û tînin gundan dişewitînin û kirinên dijmirovî dikin. Bûyera roja 5'ê avrêlê jî mînakek e ji bo kirinên wan ên qirêjî. Yek ji wezîfedarên Heyva Sor, ji ber xwe demançeyeke çardexir derdixe û girseya gel gulebaran dike û çar gundiyan dikuje.

Rûpel 2

www.arsivakurdi.org

# ARTÊŞA TIRK GUNDÊN BAŞÛR DIŞEWITÎNE

Îşgala başûrê Kurdistanê ku roja 19'ê adarê dest pê kir, di heftiya sêyemin de sebr û aram bi gelê başûr re nehişt. Leşkerên ku nikarin di şer de xwe li ber êrîşên gerîlayên ARGK'ê bigirin, dest bi valakirina gundên kurdên Başûr kirin. Di dema valakirina gundan de gelek gundiyên welatparêz ku leşker wan bi sempatîzanî û alîkarîdayîne PKK'ê sûcdar dikin, hatin qetilkirin. Li ser van kirinên hêzên artêşa tirk, kurdên Başûr bi taybetî jî yên derdora Duhokê li hemberî artêşa tirk û rayedarên PDK'ê dest bi serhildanan kirin.

Li aliyê din gerîlayên ARGK'ê bi teybatî li herêmên Metîna û Sersing, li mintiqeyên Banerne û Darayê bi çekên giran derbeyên xedar li yekineyên artêşa tirk dide. Li Haftanînê jî operasyonên artêşê li bêencam dimînin, yekineyên leşkerî li kemînên gerila deqelibin û gelek leşker têne kuştin.

Li gorî agahiyên ku ji buroya çapemeniyê ya ARGK'ê û çavkaniyên herêmê hatine standin, ji destpêka îşgalê heta niha zêdeyî 700 leşkerên tirk û gelek serbazên leşkerî bi êrîş û kemînên gerîlayan hatine kuştin.

### Dinya êdî guh nade virên KT'ê

Reaksiyon û protestoyên saziyên navneteweyî û dewletên êwrûpî jî li hemberî îşgalê bilintir dibin. Rayedarên Dewletên Yekbûyî yên Amerikayê (DYA) ji êdî mîna destpêkê piştgiriyê nadin çareseriya Dewleta tirk a leşkerî. Ji bo ku ji nû ve dilê rayedarên ewrûpî û amerîkê bêne xweşkirin, Wezîrê Karê Derve yê Tirkiyeyê Erdal Înönü roja 4'ê avrêlê dest bi geşta ber bi Ewrûpa û Amerîkayê kir.

### Qetlîamên li dijî sivîlan

Di heftiya sêyemin a îşgalê de hêzên artêşa tirk rasterast an jî bi metodên cihereng li başûrê Kurdistanê dest bi qetlîaman kirin, gund valakirin û pêkutiyên dijwar li gundiyên kurd dikin.

Di pêvjoya sê heftiyên îşgalê de hêzên lêşkerî 51 heb gundên Başûr bi darê zorê vala kirin. Di dema valakirina gundan de îşkence û zilm li gelek gundiyan hatin kirin. Mesela di roja 2'yê avrêlê hêzên artêşê digirin ser gundê çiyê ku li ser nehiya Sersingê, ye li vî gundê 6 gundî bi piştgiriya bi PKK'ê re tên sûcdarkirin û tên revandin. Dotira rojê cendekê her şeş gundiyan tê dîtin. Laşê wan bi awayekî hovane hatibûye parçekirin. Navê wan gundiyan ev in: Ahmet Feltah Hesen, Abdulkadir İzzedxan(60) serbest Abdulqadir izzedxan (13), İsmail Huseyn, Mehmet Şerip, Guli Zeki Gulî û Evdile Hesen.

### Heft şivan hatin qetilkirin

Van şeş kesan jî li gund şivanî dikirin. Ji xeynî wan hêzên artêşa tirk ji gundê Bafeyê ku li ser nehiya Kanîmasiyê ye du gundiyan (Evdile Mihemed û Evdile Silêman) dixin bin çav. Şeş gundiyên din ên ku navên wan nehatine tesbîtkirin dîsa ji aliyê hêzên dewleta tirk ve hatine girtin. Li gorî agahyên ku nûçeyanê me bi dest xistine, hêzên dewlata tirk van kesên binçavkirî bi sempatizaniya PKK'ê sûdar dike.

### Serhildana gundiyên Başûr

Li ser van hovîtiyên hêzên dewletê, gundiyên Başûr roja 5'ê avrêlê hêrs û kîna xwe didin der. Bi sedan gundiyên derdora Duhokê roja 5'ê avrêlê li hemberî van pêkutiyan, serî hildan û di navbera wan û hêzên tirk de şer derket. Di şer de 3 tirk û 4 gundiyên kurd hatin kuştin.

Li gorî nûçeya AFP'ê (Ajansa çapemeniyê ya Fransayê) roja 5'ê mehê zêdetirî 200 gundiyên derdora Duhokê dikevin rê, ji bo ku herin bi telbeyê cenazeyên 6 şivanên ku ji hêla leşkeran ve hatibûn qetilkirin. Gundî di rê de dibînin ku siwareyeke Kızılayê li stasyoneke benzinê sekiniye û 3 wezîfedarên Kızılayê û du parêzvanên wan ên pêşmerge li ba siwareyê ne. Li nêzîkî wan gundî ji otobûsên xwe peya dibin û êrîşî ser wan dikin. Di vê navê de yek ji wezîfedarên Kızılayê, ji ber xwe demançeyekê derdixe û gundiyan dide bir berekan (fişekan), çar gundiyan dikuje.

Li ser vê yekê, hêrsa gundiyan hîn zêdetir dibe, çekên pêşmergeyan ji wan distînin, pêşmerge direvin. Dû re gundî li wê derê her sê wezîfedarên Kızılayê dikujin. Piştî kuştine wan hêzên PDK'ê tên cihê bûyerê, piştî re gundî çar cenazên xwe ji wir hildidin û meşeke protastoyê li dar dixin. Li dema meşa protestoyê gundî rayedarên PDK'ê ji sûcdar dikin ji ber ku PDK nikare wan ji hêzên tirk biparêze û hevkariya dewleta tirk dike.

Li gorî nûçevanê AFP'ê ji roja ku artêşa tirk Başûr îşgal kiriye heta niha ev cara yekemîn e ku gelê Başûr bi awayekî eşkere serî li ber hêzên tirk hildide û êrîşî ser wan dike.

### Endamên Kızılayê beşdarî operasyonan dibin

Li aliyê din, li gorî çavkaniyên herêmê, gelek endamên MÎT'a tirk û tîmên taybet di nav rêxistina Kızılayê de hene. Piştî qetîlkirina gundiyan, rayedarên dewleta tirk, ji bo ku serhildana gundiyan pêl nede bi lezginî bi serokên PDK'ê û YNK'ê re ketin tekiliyê. Li aliyê din çapemeniya tirk kuştina sê "wezîfedarên" Kızılayê bervajîkirin û weşandin. Bes nûçeyên wanli hev nakin.

**Navenda Nûçeyan**




Ji rojnameya Le Monde

## Rojnamevan mêvanên me ne

Roja 31'ê adarê, gerîlayên ARGK'ê di kontrola rîya Cizîr û Nisêbînê de 2 rojnamevan bi xwe re birin. Piştî bûyerê Buroya Çapemeniya ARGK'ê daxuyaniyek da KURD–A'yê.

Di daxuyaniyê de tê gotin ku,"Muxabîrê Ajansa Reuterê Fatih Sarıbaş û muxabîrê AFP'ê Kadir Gürsel di 31'ê adarê de saet nêzîkî 21:30'yan, di rîya Cizîr û Nisêbînê, di kontrola rê de hatine tesbitkirin. Ji bo pirsiyariyê gerîlayan bi bêtêlê ji qerargehê agahî xwestine. Lê, beriya ku agahî bikevin destê gerîlayên me, hêzên dewletê mudehale dikin. Ji bo parastina canê wan gerîla ew bi xwe re dibin. Rojnamevan misafirên me ne. Siheta wan li cihe û di her şertî de tên parastin.

Ji bo berdana wan jî divê sazî û rêxistinên wekî Neteweyên Yekbûyî, Xaça Sor û hwd. bi me re bikevin têkiliyê. tê zanîn ku, artêşa faşista Tirkiyeyê qetlîema dike û dixwaze ku me bi van qetlîema sûcdar bike. Mînaka dawî jî qetlîema Görümlüya Silopîye." Rojnamevan İsmet G. Imset û saziya rojnamevan ya navneteweyî FIJ ji bo berdana rojnamevanan muracatî PKK'ê kirin.

**Welatê Me/Kurd–A**

## Çapemeniya tirk an jî çapemeniya brîfîngan

Bi destpêkirina îşgala Başûr, çapemeniya tirk di warê çewt–agahdariyê de ji berê lezgîntir bûye. Di ber re wext dibîne ku dersên rojnamegeriyê jî bide xelkê.Di Yeni Yüzyılê de Ali Kırca dibêje:" Rojnamegerên biyan hatine fîlmên ku senaryoyên wan berê hatine nivîsandin, bikişînin." Çapemeniya ku ji xeynî agahiyên berevajiya rastiyê tiştekî nanivîsînin, di menşetên xwe de didin dijmînan, ji bo tiştekî biçûk dikevin qirika hev, ji çapemeniya biyan re dibêjin:" Ew ne rojnamegerî ye." Bi xwe li ser piyekî deh viran dikin, xelkê bi derewkariyê îtham dikin. Ji ber ku nûçeyên wan ji çavkaniyekê ne, hezar fetlan didin xwe ku hinekî şiklê wan biguherînin, lê naverok tim eynî ye. Hinek ewqas şûrkêş in ku ji sibe heta êvarê taktîkên kuştinên mirovan didin dewletê, ji derdorên biyan pirsan dibarînin ku rê li ber rexneyên wan bigirin. Mesela İlnur Çevik di qunçikê xwe de evqas dide navê ku gefan li rayedarên alman dixwe, dibêje:" Binêr, êdî sebra me nema ha!"

**ANALÎZ**

Rojnamegerên tirk van rojan ji ber ku zorê didin xwe hinekî ji jîritiyê ketine, zêhf çewtiyan dikin. Mesela, çend rojan berî vê Kanal 6'yê nûçeyek weşand. Di vê nûçeyê de tê gotin ku bombeyek di destê zarokekî de teqiye, ew ji destekî xwe û çavekî xwe bûye, mesûlê vê yekê jî "terorîst" in. Lê dema bi zarok re diaxivin, rengê nûçeyê diguhere. Zarok dide zanîn ku leşkeran bi qestî bombe daye wî. Dîsa kanala TGRT ji bo ku têkçûna gerîlayan îsbat bike cih da, peyivîna bêtêlê ya di navbera du gerîlayan de. Peyivîn bi kurmancî bû û qet tiştekî ku bi kêrî wan were di nav de tunebû. Li aliyê din rojnameya Sabahê roja 31'ê adarê cih da nûçeyekê. Nûçe behsa merasîma cenazeyê Altuğ Aktan dike. Mirov jê hîn dibe ku ew üsttegmenê hewayî ye û ji ber ku roketek rastî helîkoptera wî hatiye ew miriye. Lê tu rojnameyan heta niha qala ketina helîkopterekê nekiribûn. Hin caran nûçeyên wan li hev nakin, wekî êrîşa ku gelê Başûr anî ser konvoya Kızılayê. Dema rojnameyek an TV'yek tirk nûçeyeke cihêreng bide, ji rêzê derkeve, tavilê "brîfîngê dixwe." Ji ber vê yekê navê wê yê 3'yan, Çapemeniya Brîfîngan ê. Navê wê yê duyemîn wekî te zanîn, çapemeniya mehmetçik e.

**SAMÎ BERBANG**

JÛJÎ — Doğan Güzel




# Kızılaya tirk bûye şaxekî MÎT'ê

Şerê taybet ê dewleta tirk bi destê hemû rêxistinên wê tê pêkanin. Ji dibistanên tirk û dadgehan bigirin, ta pastexane û komeleyên rojnamevanên tirk, tev mîna şaxên hêzên şere taybet ên dewletê dixebitin. Ger bigotana rêxistinên însanî yên mîna Kızılayê (Heyva sor a tirk) jî di bin xizmeta şerê taybet de ne, kesî bawer nedikir.

Lê mixabin bûyerên dawî yên ku li başûrê Kurdistanên diqewimin nîşan didin û îspat dikin ku Kızılaya tirk jî ketiye bin xizmeta MÎT'ê û Tîmen taybet ên tirk.

Li gorî çavkaniyên herêma Başûr, tîmên taybet û endamên MÎT'a tirk bi kincên wezifedarên Kızılayê dikevin nav gundên Başûr, ajantiyê dikin, bi siwareyên vê rêxistinê çek û silahan dibin û tînin gundan dişewitînin û kirinên dijmirovî dikin. Bûyera roja 5'ê avrêlê ji mînakek e ji bo kirinên wan ên qirêjî. Yek ji wezifedarên Kızılayê ji ber xwe demançeyeke çardexwir derdixe û girseya gel gulebaran dike û çar gundiyan dikuje. Eger ew wezîfedarên Kızılayê bin demançeya çardexwir bi wan re çi dike.

Wekî din li gorî gotinên nûçevanekî televizyoneke tirk (HBB) ku nexwest em navê wî bidin, wezîfedarên Kızılayê bi şev derdikevin operasyonan. Mesela yek ji wan ji nûçevanê HBB re dibêje: "Me îro şeş xanîyên sempatîzanên PKK'ê firandin hewayê." Dewleta tirk ji aliyekî ve bi navê alîkariya mirovî Kızılayê a tirk dişinê Başûr û xwe mirovhez nîşan dide, ji aliyê din ve Kızılay mîna şaxekî hêzên taybet ên dewleta tirk dikeve nava Başûr û qetlîaman pêk tîne.

**Navenda Nûçeyan**

# Parlamentoya Kurdistanê ava dibe

Parlementoya Kurdistanê ya li Derve vedibe. Li ser navê Komîteya Amadekar Remzî Kartal daxuyand ku wê parlemento di 12' vê mehê de vebe. Kartal der barê cihê ku Parlementoya Kurdistanê lê vebe agahî neda û gote ku navê cih û welêt veşarî ye.

Kartal di daxuyaniya xwe de vekirina Parlementoya Kurdistanê ya li Derve wekî "bûyereke dîrokî" nirxand û da zanîn ku êdî qonaxa ku gelê kurd gihiyayê ye saziyên wiha dixwaze.

Ji aliyê din ve mebûsên Parlementoya Sirgûnê dan û standinên xwe yên bi rayedarên dewletên cur bi cur re didomînin. Heyata Parlementoya Kurdistanê, di 5'ê avrêlê de li bajarê Lîzbona Portekîzê civînek çapemeniyê çêkir û der heqê operasyona komara tirk de ya li başûre Kurdistanê ya işgalkirinê agahî dan rojnamevan û beşdaran. Ji aliyê din ve heyet bi parlementerê Ewrupayê yê Partiya Komunîst Mîguel Urbano Rodrîgez û parlementerê Partiya Sosyalist Carlos Luis re hevdîtin pêk anîn.

Herdu partî pirsnameyekê jî dan parlementoya xwe û pirsname hate qebûlkirin. Parlementoya Portekîzê danezanek belav kir û tê de diyar dike ku divê komara tirk tavilê ji Başûre Kurdistanê vekişe û bi nûnerê gelê kurd re dest bi hevdîtinan bike.

**Navenda Nûçeyan**

# Li Îranê 145 kes hatin kuştin

Li du navçeyên Îranê bi hezaran kesî zêdebûna buhayê neftê û nebûna avê protesto kirin. Di van bûyerên ku roja 2'yê avrêlê pêk hatin de polîsan berik reşandin ser gel û zêdetirî sed kesî hatin kuştin, evqas mirov jî birîndar bûn. Piştî protestoyên ku li Îslamşahr û Ekberadê pêk hatin, hêzên dewletê gelek kes girtin bin çav. Li van derên ku bi piranî lê karker dimînin, protestovanan du îstasyonên benzînê jî şewitandin. Çapemeniya resmî kesên ku protesto li dar xistin wekî opotunîst bi nav kir û alîgirên rejîmê jî roja 3'yê mehê bi xwepêşdanekê piştgiriya xwe ya ji bo rejîmê nîşan dan.

Li Îranê ji sala 1979'an bi vir ve mele li ser kar in. Ji 15 salên hikimdariya wan 10 sal di nava şer de derbas bûn.

**Navenda Nûçeyan**

## Kesên "windayî" li ku ne?"

Malbatên kesên ku ji ber bûyerên Gazî û Ümraniyeyê hatine girtin, roja 4'ê mehê li ber Walîtiya Stenbolê livbaziya rûniştinê pêk anîn. Polîs têkilî livbaziyê kir û ji malbatan gelek kes binçav kirin.

Li Stenbolê li ber deriyên walîtiyê malbatên kesên girtî û "windayî" livbaziyek çêkirin. Ji rayedarên dewletê xwestin ku zarokên wan ên girtî û windayî bêne berdan û dîtin. Polîsan bi jop û daran êrîşî ser livbazan kir û gelek ji wan hildan binçav. Piştî bûyerê, malbat an li Komeleya Mafên Mirovan (KMM) civînek çêkirin û daxuyandin ku dewlet li dû dek û dolaban e. Malbat an dan zanîn ku ew kesên wekî "provokator" hatine nîşandan û girtin ne wisa ne û dewlet dixwaze xwe bi wan fênan xelas bike. Ji aliyê din ve ji bo dîtina kesên "windayî" û berdana kesên girtî malbat an li gelek cihan dest bi xweragirtina birçîbûnê kirin. Grev di roja 3'yê avrêlê de li dar ket. Kesên ku li KMM'ê Komeleyên Pîr Sultan Abdal ên Ümraniye, Esenyurt, Îkîtellî û Gülsuyuyê di xweragirtina birçîbûnê de ne ev daxuyanî kirin; ji ku ber mesûlên qetlîama Gaziyê bêne mehkemekirin dest bi vê grevê kiriye.

## KURTENÛÇE...KURT

### Li Hezo 23 leşker mirin

Gerîlayên ARGK'ê roja 1'ê avrêlê avêtin ser mala kumandarê qereqola Îsmailkayê Hezoyê, piştî cerda ser mala kumandar gerîlayan 3 cemse û panzerek xistên kemîna xwe.

Li Hezoyê, gerîlayan cerdî mala kumadarê qereqola Îsmailkayê kirin, qumandar û mêvanên wî di cerda gerîlayan de mirin, piştî vê êrîşê, gerîlayên li nêzîkî mala kumandêr hêzên ku ji bo mûdaheleyê hatin xistin kemîna xwe. Di kemîna gerîlayan de 3 cemse û panzerek tehrîp bûn. Cemse ji ber gulebarana dijwar şewitîn. Li gorî agahiyên çavkaniyên herêmê di vî şerî de 23 leşker mirine.

**Kurd-A**

### Walî ji mirinê filitî

Roja 30'yê adarê, erebeya Waliyê Êlihê Salih Şarman, li navbera Amedê û Êlihê ji aliyê gerîlayên ARGK'ê ve hate gulebarankirin.

Gerîlayên ARGK'ê di navbera Amedê û Êlihê de, nêzîkî Pira Malabadê, bi roket û tivingan êrîşî tîmên taybet kirin. Piştî êrîşî di navbera gerîlayan û tîmên taybet de şer derket. Walî Şarman ji bo ku li cihê şer çavdêriyê bike bi konvoya taqwiyê re dikeve rê. Gerîla konvoyê gulebaran dikin û erebeya walî jî ji gulebaranê nesîbê xwe distine. Lê bi şenseke mezin Şarman bêbirîn difilite. Di şer de gerîlayan zeyiyet neda, derheqê zeyiyetên tîmên taybet de agahî bi dest neketin.

**Welatê Me/ Êlih**

### Ala tirk şewitandin

Li paytexta Rûsya, li Moskovê, îşgala komara tirk ya başûrê Kurdistanê li ber balyozxaneya Tirkiyeyê hate protestokirin. Roja 4'ê adarê li ber balyozxaneya Tirkiyeyê ya li Moskovê, nêzîkî 200 kurdî îşgala Başûr protesto kirin. Protesto nêzîkî 4-5 saetan dom kir û protestvanan bi zimanê kurdî, rûsî û tirkî sloganên wekî: "Bijî PKK, Bijî Serok Apo, Bijî gerîla" avêtin. Protestvanan di dawiya livbaziyê de ala tirkan jî şewitandin. Gelek rojnamevanên rûsî jî li wir amade bûn. Polîsên rûsî mudexeleya wan nekir û protesto bêteşqele qediya.

**Welatê Me/Moskov**

### Protestoya dixtoran

Komeleya Dixtorên Demokrat ku navenda wan li Frankfurtê ye, roja 21'ê adarê daxuyaniyek şandin ji çapemeniyê re û îşgalbûna başûrê Kurdistanê protesto kirin.

Komeleya dixtoran di daxuyaniyê de cih dan van gotinan," Komara Tirk, PKK'ê ji xwe re dike mane û di cejna kurdan ya neteweyî Newrozê de, bi zanîn dest bi êrîşî dike û armanca êrîşê jî eşkere ye ku sivîl in. Komara Tirk bi silehên almana û perçiqandina peymanên navneteweyî vî karî dike." Di dawiya daxuyaniyê de dixtoran bang li Konseya Ewrûpa û Yekîtiya Neteweya kirin da ku ew jî îşgalê protesto bikin.

Navên **10** kesên ku di xaçepirsa hejmara 19'an de peyva veşarî **'Melkemot'** dîtine û pirtûka **"Keskesor"** qezenc kirine:

**Azad Göksu**
**Amed**

Musa İltemiş
Îzmîr

**Rüstem Yılmaz**
**Êlih**

A.Hekim Ormancı
Stenbol

**Alişen Avcı**
**Qoser / Mêrdîn**

Fikret Arda
Amed

**A. Akkuş**
**Enqere**

Zana Şil
Êlih

**Halime S. Çiçek**
**Îzmîr**

A. Aziz Batur
Îzmîr

**İşgala artêşa tirk a başûrê Kurdistanê di rojeva hemû çapemenî û medyaya Ewrûpayê de giraniya xwe didomîne**

# Kîjan rojnameyên biyan çi got

1– Leşkerên tirk dixwazin başurê Kurdistanê bê jîndar bikin. **R. Die Zeit**

2– Vê Tirkiyeyê li rêza Ewurpayê nejimêrin (nehesibînin). **R. Taz**

3– Xatun Çiller pir bêbext e (bê şans e). **R. Die Zeit**

4– Êrîşa leşkerên tirk PKK'ê xurt dike. **R. Suddeutsche Zeitung**

5– Siyaseta Ankarayê ya li hemberî gelê kurd pir tûj e. **R. Frankfurter Rundschau**


6– Dewleta tirk rewşa rêveberiya awarte li Kurdistanê berdewam dike. **R. Beliner Zeitung**

7– Kes û rêxistinên mafê mirovan mayîna kurdan li Almanyayê dixwazin. **R. Frakfurtir Rundschau**

8– Xwe xurt kirina dewleta tirk ji aliyê çekan ve bi mebesta qirkirina kurdan e. **R. Taz**

9– Careke din dewleta alman şandina çekên ji bo Tirkiye dide rawestandin. **R. Suddeutsche Zeitung**

**AMADEKAR: DILÊR**



**Tu belge tune ye ku çekên Almanyayê li Kurdistanê tên bikaranîn.**

**Girtiyên Bursa, Çankırı û Haymanayê îşgal protesto kirin:**

# 'Bêdengî pejirandin e'

Piştî îşgala başûrê Kurdistanê, girtiyên siyasî yên ji dozê cur bi cur daxuyanî şandin û îşgal protesto kirin. Dilên Girtîgeha Bursa, Çankırıyê û ji Girtîgeha Haymanayê Doç. Haluk Gerger û Remzî Küçükertan ev hovîtî û îşgalê bi greva birçîbûnê ji bo 2 rojan, protesto kirin. Girtiyan di daxuyaniyên xwe de gotin ku, gerek e artêşa tirk derhal ji başûrê Kurdistanê vekişe û dev ji qetlîema xwe berde. Dîsa girtiyan bang li rayagiştî û hemû mirovahiyê kirin û gotin ku bêdengî tesdîqkirin e û bila dengê xwe bilind bikin.

**Navenda Nûçeyan**

## XAÇEPIRSA BIXELAT (19)



H Y Q Û
K E L E P O R
J E N O S Î D
X A K L E T M
A A R A M R O
A Q I L N E H L A
A N Î N R E V
A R Ç A N D I N Î
K E L A N Î S K
Î R A Î S O T A U

PEYVA VEŞARÎ: M E L K E M O T

Xaçepirsa me bixelat e. Di 15 rojan de çi bersiv bigihîjin me, em dinirxînin. Xelat bi usûla qurayê li deh kesan tên belavkirin. Xelata hejmara 21'an; pirtûka **Çexov Bexçeyê Vîşne"** ye. Ev pirtûk ji aliyê weşanxaneya NÛDEM'ê ve hatiye çapkirin.
**Jêrenot:**
Ji bo ku bersiva we bê nirxandin, divê hûn "Peyva Veşarî" di nava qutiyên li bin xaçepirsê de binivîsin û tevî adresa xwe ji me re bişînin.

**Xelata Xaçepirsê**

ÇEXOV
Bexçeyê Vîşne



"Bexçeyê Vîşne"
**Çexov**

## XAÇEPIRSA BIXELAT (21)



Hewar feryad
Kesê di wêne de
Navek
Jin, afret
Celebek fotografê
Merşa neteweyî
Gihanekek
Strî
Dardekirin
Siyaset
Enstrûmanek
Cejn
Mehek
Temsîlbar
Carbon
Mam
Nîştiman
Navek
Kurtenivîsa Doktor
Oksîjen
Êl, eşîr
Pirça li serî
Haydê
Firoşkarê seyar
Hîdrojen
Sen'at
Teyreke dirinde
Zemîn
Sembola neteweyan
Felaket
Pê por rast dibe
Sembola Vanadyûmê
Bajar
Zeviya tirî
Biedalet adîl
Îstixbarata Tirk
Li Almanyayê robarek

PEYVA VEŞARÎ: 1 2 3 4 5 6 7 8 9 10 11



www.arsivakurd.org

Stranbêja ecem a navdar Marzeih:

# 'MELE LI DIJÎ HER TIŞTÎ NE'



Stranbêja navdar Marzeih

Stranbêja îranî ya navdar Marzeih piştî ku rejîma olperest îmkana stranbêjiyê jê re nehişt, havîna par ji bo ku tevî Mucahidien Xelq bibe, çû Parîsê. Ew di hevpeyvîneke xwe de li ser rewşa siyasî ya Îranê û rewşa jinan li wî welatê tiştên girîng dibêje. Navê Marzeihê yê rastîn Eşref os-Saadet Morteza'i ye û ew 71 salî ye. Em qismekî ji wê hevpeyvîna ku di kovara Newsweekê ya bi mêjûya 3'yê avrêlê de derket, pêşkeşî xwendevanên xwe dikin.

**Hûn çima ji Îranê veqetîn?**

– Li Îranê jin di rewşeke zêhf xerab de dijîn. Ez tenê mînakekê bidim, li gorî biryareke dawîn a dadgerên îslamî heke cezayê kuştinê ji bo keçekê bê dayîn, divê pêşî ji qîzantiyê bê xistin. Lewre dema qîz be, dibe ku ew here bihuştê. Gelek kirinên bi vî rengî yên ku li jinan tê kirin, îmkan nehişt ku ez li wir bimînim. Loma tevî ku ez jiyana malbata xwe ya li Îranê mayî bixim nava xetereyê, ez ji welatê xwe veqetîm.

**Ji bo çi rayedarên îslamî yên Îranê stirîn li te qedexe kirin?**

–Ma hûn dizanin ku tenê ji ber nîşandana qevdek porê xwe, li Îranê jin dikare bi cezayê 74 qamçiyan bê sizakirin. Dema jinek lêvên xwe boyax bike "parêzkarên şoreşê" karin lêvên wê bi jîletê jê bikin. Heke boyaxê li rûyê xwe bide, ew karin asîdê biavêjin rûyê wê û bişewitînin. Herwiha hûn karin tewra wan a li hemberî staranên min ên evînê jî bînin ber çavên xwe.

**Heke rejîma îslamî li ber dilê gel ewqas reş e, ji bo çi ew nayê hilweşandin?**

– Dinya tê nagihîje ku zilma li ser gelê Îranê çiqas tund e. Li Îranê herkes dizane ku rejîm kare mirovan li nava kolanê jî gulebaran bike.

**Gelo Îmkan heye ku mele xwe bi xwe ber bi hikûmeteke pirtir bitolerans û laîk ve werin?**

– Divê kes ji meleyan hêviya reformên xwe bi xwe neke. Civaka Navneteweyî pêwist e karekî hilgire ser milê xwe, ger dixwaze li Îranê demokrasî ava bibe. Min divê hemû hikûmetên demokratîk Tehranê bi awayekî eşkere boykot bikin.

**Ma rejîma berê ya di bin hukmê Şah de hîn çêtir bû?**

– Tu guman tune ku rêveberiya Şah, rêveberiyeke polîsan a gemarî bû. Lê meleyan ji şah jî derbas kir. Zordariya wan li ser xîmê ol ava bûye, ew jî tê wê maneyê ku ew tenê li hemberî Xwede berpirsiyar in. Kirêtiya meleyan jî ji ya Şah borî. Mele dewlemendiyên welêt yên serd û binerd li xwe xerc dikin. Li Tehranê û hinek derên din ji xwe re qesr û qonax lê kirine. Jinên wan diçin li Parîsê, li Newyorkê li Fifth Avenue ji xwe re kincan dikirin. Dema dizivirin Îranê, wan kincan di bin hêzarên xwe de vedişêrin. Meleyan ji xwe re Mercedess'ên ku gule lê karê nakin kirîne. Ew hêkên masiyan ango havyar dixwin, li milyonan dolar dizîne û ew di bankayên Swisreyê razandine.

**Di jiyana mirovên ji rêze de tu bipêşketin çêbûye?**

– Mirov pê diêşe, lê divê rastî bê gotin, wan mirovên ku xwe didan ber guleyên ku dihatin Ayetullah Xumeynî, niha pirtirîn ji destê rejîmê dikişînin. Ew niha bi hêsanî nerazîbûna xwe tînin zimên, lê tiştek ji destê wan nayê.

**Van rojan ji bo hunera li Îranê hê jî hûn hêvîdar in?**

–Hem hunermend û hem jî rewşenbîr pir tên êşandin. Hinek stranbêjên me yên baştirîn di nava tenêbûnê de mirin. Mele li dijî her tiştî ne. Xumeynî bixwe çavdêriya berhemên hunerî dikir. Lê mirovên hunermend hê jî agirê hunerê wekî bizoteki pêxisti hiştine. Gelê Îranê, gelekî liberxwedêr e, ez bawer nakim ku mele karibin bi giştî kurmê hunerê yê di giyana gel de bikujin. Lê bêguman ew dema tarîtirîn a dîroka Îranê ye. Birek mirovên ku karibûne kasetên min bi dest bixin, bi walkmenê lê guhdarî dikin ji bo neyên kifşkirin. Dengê min ew bû 50 sal ku di guhên gelê Îranê de ye, mele nikarin bi hêsanî gel jê bikin. Niha gel dikare ji radyoya Mucahidin ku li derve weşanê dike, dengê min bihîze.

**Hûn hêvî dikin ku rojekê hûnê vegerin Îranê?**

– Ez ji bo mişextiyeke heta hetayê ji Îranê veneqetîm. Ez ketim nav refên liberxwedanê ku em rejîma meleyan hilweşînin.

WERGER:
SAMÎ BERBANG

# Penaberên Rwandayî li sînorê Tanzanyayê asê bûn

Di salvegera şerê hundirîn yê Rwandayê de, şerê hutu û tutsiyan îcar xwe li Burundiyê da der. Piştî êrîşa şervanên tutsiyan a ser kampên penaberên li bakurê Burundiyê 50 hezaran kes ji bo derbasî Tanzanyayê bibin, dest bi koçê kirin.

Fransayê piştî bûyeran Wezîrê Hevkariyê Bernard Debre ji bo navberdîtinê şand Burundiyê.

Niha tê gotin ku xebatên wî bûne sebeba hinek gavên ber bi aştiyê. Li ser vê yekê rayedarên Tanzanyayê roja 31'ê adarê sînorê xwe girtin. Peywirdariya Bilind a Neteweyên Yekbûyî ya ji bo Penaberan (UNHCR) da zanîn ku 8700 penaber bi şûn ve vegerîne kampê xwe. Penaberên din jî ji bo vegerê hatine îknakirin. Lê wan ew çareserî wekî çareyeke dem demî bi nav kir.

Piştî şerê li Rwandayê yê 3 mehan, nêzî 2 milyon penaber li çend welatên mîna Zaire û Burundiyê belav bûbûn. Hinek ji wan ji tîrmeha 1994'an ve li bakurê Burundiyê bi cih bûne. Piraniya wan hutuyî ne û di nav de kesên ji qetlîema tutsiyên sivîl berpirsiyar jî hene.

Li Burundiyê jî ev her du qebîleyên ku li Rwandayê şer kirin, hene. Li vî welatî hikûmet di destê hutuyan de ye, lê artêş di bin konrola tutsiyan de ye, ji ber vê yekê xebatkarên rêxistinên alîkariyê ditirsin ku ew cure qirkirin îcar li Burundiyê dest pê bike.

**Nûçeyên Derve**

**Piştî şerê li Rwandayê yê 3 mehan, nêzî 2 milyon penaber li çend welatên mîna Zaire û Burundiyê belav bûbûn. Hinek ji wan ji tîrmeha 1994'an ve li bakurê Burundiyê bi cih bûne. Piraniya wan hutuyî ne û di nav de kesên ji qetlîema tutsiyên sivîl berpirsiyar jî hene.**



www.arsivakurdi.org

# FAL

**BERAN (21 Adar - 20 Avrêl)**

Dest li ser destan hetanî ezmanê heftan. Hêviya we ji çi ye, mirovahî ew e ku ji rê û şopan veneqete, giraniya cihê xwe bizanibe û fikrên xwe bikaribe bide pejirandin. Pir kes ji we gazincan dikin, hinekî çavên xwe vekin, li der dora xwe binêrin.

**GA (21 Avrêl - 21 Gulan)**

Ji we tê ku hûn bibêjin:" Ez mirovekî zimanşîrîn im," zimanê şîrîn mar ji qulê derdixe, lê belê nehatiye dîtin ku mirovên wekî we rûsar û cidî zimanxweş bên qebûlkirin. Şirînahî hinekî xwe ji mirûzê mirov dide der.

**CÊWÎ (22 Gulan - 21 Pûşper)**

Carinan hûn xelet difikirin. Dema civaka ku hûn tê de ne, we bi zimanekî sivik rexne dike, hûn qet li xwe venagerin. Rexneyên tûj wê we şermazer bikin, hay ji xwe hebin. Dibe ku hin kes werin xwazgîniya we, yan jî hûn herin xwezgîniyê.

**KEVJAL (22 Pûşper - 23 Tîrmeh)**

Kenê we û girîna we ji hev nayê derxistin. Ji ber vê yekê kes bi derdê we nahese. Dersên Şanogeriyê wê ji bo we pir bikêr bin. Îhtimal e ku ji we re tûrek gûz ji gund were. Tasek ava kaniyê bidin mirovekî xizan, da ku gûzên we pûç dernekevin.

**ŞÊR (24 Tîrmeh - 23 Gelawêj)**

Tirsa we ji çi ye? Ji her ewrî baran nayê, lê dîsa jî bi tevdîr bin, ji xwe re sîwanekê bikirin. Bi hatina biharê hin kes li belayê digerin, xwe ji wan biparêzin. Karê xwe zû bikin, lewre dibe ku mîvanên we werin.

**SIMBIL (24 Gelawêj - 23 Rezber)**

Tê dîtin ku di hinek waran de hûn dîsa pisporiya xwe diminin. Heke ev tişt ji bo we pir ne pêwist in, dev jê berdin. Çavên xwe ji tava bihara biparêzin, da ku hûn nebin xwediyê berçavkeke xweşik.

**MÊZÎN (24 Rezber - 23 Kewçêr)**

Hûn tiştekî dikin, dîsa alemê pê dihesînin. Qet haya we ji qeyideyên xebata nependî nîn e. Bizanibin ku hûn bi vê tewra xwe zirarê didin derdora xwe jî. Heke bi vî awayî here, dibe ku hin kes bibêjin:" Ne ew hêka be, ne jî ew qidqidîka."

**DÛPIŞK (24 Kewçêr - 22 Sermawez)**

Ji aliyê aboriyê ve tengasiya we pir e, hûn dixwazin bi bergiriyên biçûk du aliyên qelîştekê bidin hev. Lê bi vî awayî ev mesele hel nabe. Wekî dibêjin, bi gulekê bihar nayê. Divê hûn li çareyên din bigerin.

**KEVAN (23 Sermawez - 21 Berfanbar)**

Hûn wekî Mîrîşkên birçî di xewna xwe de çala gêris dibînin.Bi ya me hûn dest bi şîrovekirina xewnên xwe bikin û wan bidin çapê çêtir e. Hûn pir nefsbiçûk in, divê hûn hinekî qure bin. Heke kes pesna we nede divê hûn pesna xwe bidin.

**KARIK (22 Berfanbar - 20 Rêbendan)**

Ji hirçekî du eyar dernayên. Hûn pir zorê didin xwe, da ku du karan bi hev re bikin, lê hûn têk diçin. Pêwiste ku hûn armanca xwe ya yekemîn berî pêşîn bibin serî, pişt re dest biavêjin karekî din. Li ber mala xwe dareke spîndarê biçînin.

**DEWLIK (21 Rêbendan - 11 Reşemî)**

Di jiyana we de pêwist e ku guherînek çêbe. Ger hûn bixwazin jiyana we rengîn bibe, giraniya xwe bidin ser xwendina wêje, çand û hunerê. Xewneke we wê rast derkeve, pirtûka ku we pir jê hez kir wê bê berhevkirin.

**MASÎ (20 Reşemî - 20 Adar)**

Xirakirin asan e, lê avakirin bizehmet e. Hûn dilê hemû hevalên xwe dihêlin. Divê hûn baş bizanibin ku karê herî dijwar tîmarkirina dilê şikestî ye. Dema we gavek avêt hay ji xwe we hebin, nexwe hûnê tîk û tenê bimînin.



# Mele û rojî

Berdevkê hikûmetê Yıldırım Aktuna di televizyonê de digot: "Ji bo ku zarokên kurd di xwendina xwe de li hemberî zarokên tirk li paş nemînin, em naxwazin ku bi kurdî dibistan vebin."

Mixabin wî digot qey emê jê re bêjin: "Wey Xwedê ji we razî be ku hûn bi vê yekê qenciya me dixwazin."

Ew jî wekî mele dikin. Mele diçe gundekî. Meha rojiyê tê, gundî tev rojiyê digirin. Wexta ku dibe êvar mele berî wext bi nîv saetê azanê dide û gundî jî difitirin.

Wextek tê nabeyna mele û gundiya xera dibe û şer dikin. Di nav derbên lêxistina gundiyan de mele di ber xwe de dibêje:

– Lêxin, lawo lêxin. Ev jî, ji bo qenciya ku min bi we dikir e. Di rojiyê de tim berî wext min ji we re azan dida. Qencî bi we nabe.

We gavê gundî pê dihesin ku çawa "qencî" bi wan hatiye kirin.

**MAMOSTE BEDRAN BÊNAV**

# Polîs wê dersên mafên mirovan bidin

Di çapemeniya tirk de roj nîn e ku li ser mafên mirovan û perçiqandina wan, nivîs û nûçe derneyên. Lê van rojan di çapemeniyê de gelek tiştên ecêp û balkêş derketin. Ên bala me kişandin; Serok Wezîr Çiller, "Aletên îşkenceyan bila polîs ji qereqolan hildin û wekî polîsên Ewrûpa û Amerîkayê pirsiyariya girtiyan bikin." Wezîrê Karê Hundirîn Nahit Menteşe, "Li Tirkiyeyê îşkence nîn e." Wezîrê ku ji Mafên Mirovan Berpirsiyar e, berê Azimet Köylüoğlu, "Li Tirkiyeyê 28 celeb îşkence heye." Gerînendeyê Giştî yê Emniyetê Mehmet Ağar, "Wê dersên mafên mirovan polîs bidin."

Gava mirov li van gotinan binêre, dikare bibêje xwediyê van gotinan ji dewletên cur bi cur in. Lê, ev kes rayedarên dewleta tirk in.

Tiştê ku ez zehf meraq dikim, gotina Gerînendeyê Rêxistina Polîsan Mehmet Ağar e. Polîs, gava dersên mafên mirovan bidin wê çi hînî xelkê bikin? Gelo wê teknîkên xweparastina ji îşkenceyan hîn bikin? An, wê teknîkên nû nîşanî xelkê bidin ku bi vê yekê xelkê bitirsînin da ku ew û li hemberî ranebin.

**ÎSMETÊ ÛSIF**

# Qasî nokên di kundir de selawat

Mirovek hebû, her tim mirov dixapandin û destê wî ne paqij bû. Demek tê ji emelê xwe fedî dike û dibêje: "Ezê herim cem şêx tobe bikim." Dide rê û dihere cem şêx. Dibêje: "Şêxê min, heta niha min pir tiştên nebaş kirine, ez dixwazim tobe bikim. Ji bo tobekirinê divê ez çi bikim?"

Şêx dibêje: "Divê tu rojê hezar selawatan bikişînî, wê demê tê efû bibî, tu nekişînî tu efû nabî."

Ew mirov dihere malê, carekê, duduyan selawatan dikişîne, lê belê pir aciz dibe. Difikire ku vî şertî sivik bike. Diçe kundir tîne û hezar nokî dixe hundirê wî. Her roj kundir datîne ser destê xwe û carekê bi aliyê çepê ve diqulibîne, carekê bi aliyê rastê diqulibîne û di bêje: "Qasî van nokên di kundir de selewat li ser ruhê mihemed" û kundir datîne cihê wî. Li şûna hezar selewatî carekê selawatê dikişîne.

**ÇIYA MAZÎ**

www.arsivakurdi.org

**Ji berpirsên ERNK'ê Alî Garzan:**

# 'Sosyaldemokratên sexte nikarin kesî bixapînin'

Nûnerê ERNK'ê yê Ewrûpayê Ali Garzan li ser gerên Erdal Inönü û Hikmet Çetin daxuyaniyek da çapemeniyê. Di daxuyaniyê de ew çalakiyên wan wekî hewldanên dewleta tirk ên ji bo xapandina gelê Ewrûpayê tên binavkirin. Daxuyanî dide zanîn ku gelê Ewrûpayê li hemberî dagirkirina başûrê Kurdistanê bi rik e û ji ber vê yekê "kesî guhê xwe nedaye derewên sosyal demokratên sexte."

Ali Garzan hikûmeta nû wekî dûmahîka hikûmeta berê bi nav dike û dide zanîn ku wê xwe radestî militarîzm û şovenîzmê kiriye. Nûnerê ERNK'ê ji dewletên ewrûpî dixwaze ku alîkariya şerê qirêjî nekin, da ku rê li ber çareseriyeke siyasî vebe. Daxuyanî wiha dom dike:" Helwesta hinek dewletên ewrûpî ku PKK'ê wekî terorîst bi nav dikin, casaretê dide dagirkerên tirk da ku kirinên xwe yên hov bidomînin."

Daxuyanî armanca îşgala Başûr jî wekî," li Başûr bi cih bûn û artêşa Sedem dawetî vê derê kirin" şîrove dike. Ew dibêje ku artêşa tirk zirarê dide mirovên sivîl ji ber ku zora wê li gerîla nabe.

Nûnerê ERNK'ê Garzan bi daxuyaniyê riya çareseriyê jî nîşan da got:" Divê mafên gelê kurd ên neteweyî bên nasîn, nexwe demokrasî nayê Tirkiyeyê." Dîsa wî got ku PKK hem ji bo aştiyê hem jî ji bo şer amade ye û bi van kirinan dewleta tirk çala xwe dikole.

**Kurd-A**

# Dewlet biratiyê naxwaze

Roja 31'ê adarê li gundê Sutaşiya Samandağê ku li ser Antakyayê ye, Serokê DEP'ê yê berê Mehmet Latifeci û bavê wî Yahya Latifeci ji aliyê kontrayan ve hate gulebarankirin. Di bûyerê de Mehmet Latifeci û bavê wî mirin, dayika wî û 7 kesên li derdorê birîndar bûn. 1'ê avrêlê, cenaze li gundê Sutaşiyê bi beşdariya 500 kesî tevî bi sloganên mîna, "Bijî Biratiya gelan, Şehîd Namirin" hatin veşartin. Tê gotin ku, malbata Latifeci jî di nav de, gundê Sutaşi axlebî erebên elewî ne. Latifeci jî, di navbera gelê kurd û erebên herêmê de wekî pirekê bû. Roja 5'ê avrêlê, ji Edeneyê ji rêxistinên HADEP'ê yên bajêr û navçeyan endam û rayedar bi konvoyeke ji 10 erebeyan pêkhatî çûne gundê Sutaşiyê. Heyeta HADEP'ê heta kete nava gund, ji aliyê hêzên dewletê ve 3 caran hate sekinandin. Derdora gund jî bi panzeran ve hatibû girtin.

**Welatê Me / Edene**

# Li Stenbolê rojên bifilm

Festîvala 14'an a Stenbolê ya fîlman vê heftiyê li Stenbolê dest pê kir. Ji pênc parzemînan li dora 145 fîlmên navdar di vê festîvalê de tên pêşkêşkirin. Di festîval Stenbolê ya Fîlman de ku ji aliyê Weqfa Çand û Hunerê ya Stenbolê tê sazkirin, ji fîlmên, herî navdar ên hemû dinyayê paronamayek fireh cih digire.

Festîval, mîna yên salên berê dîsa ji hin beş û bernameyên kevneşopî pêk tê. Beşên wê ev in: Ji wêjeyê ber bi perdeya spî. Stêrkên ciwan ên dinyaya sînemayê. Ji festîvalên navneteweyî.

Fîlmên gelek derhêner û stêrkên (lîstikvanên navdar) binavûdeng di festîvalê de hene. Çend nav û fîlmên giring: Ang Lee, Zhang Yimav, Andre Techine, Andre Konchalovsky, Nikita Mihalkov, Yılmaz Güney. Masiyên ji avê derketî, Îvanê Erjeng, Evîna Min Hîroşîma, Berî ku baran bibare, Nasthville, Gorî, Çêlek, Emê sibe hev û din bibînin, Hamlet û hwd.

**DIK**


## 'Tu hatî, lê ne bi xêr hatî Herr Erdal!'



Hefteya borî Wezîrê Karê Derve yê Tirkiyeyê Erdal Inönü, ji bo ku reaksiyona dewletên Ewrûpayê û Dewletên Yekbûyî yên Amerikayê nerm bike, dest bi gerekê kir û çû Ewrûpayê. Çapemeniya tirk û dewlet ji Înönü gelek hîvîdar bû ku, vî karî pêk bîne. Lê ev car wekî xwestina dilê wan derneket. Li Ewrûpayê hikûmet çiqas dengê xwe zehf bilind nekin jî, raya giştî vê hovîtiyê qebûl nake û reaksiyonên cur bi cur nîşan dide.

Çapemenî û rayagiştî ya Almanyayê, hikûmeta xwe bi dijwarî rexne dike û jê tedbîrên dijwartir dixwaze. Li ser vê mijarê di TV û rojnameyan de gelek tişt hate gotin û nivîsandin. Lê, gotinên herî balkêş, programa RTL'ê ya nûçe-magazin "Punkt 12" bû. Di programê de li ser ziyareta Wezîrî Karê Derve yê Tirkiyeyê Erdal Înönü, spîker wisa dibêje," Gelê mêvanan hûn bi xêr hatin programa Punkt 12'yan. Lê hûn, birêz Erdal Înönü hûn ne bi xêr hatin Almanyayê! Hûn xwe wekî dostekî nîşan didin. Lê hûn û hikûmeta we, sûcê mezin dikin. Artêşa we îro ketiye erdê Kurdistana Başûr û hûn li wir sivîlan dikujin. Bi kurdên li wir re şer dikin. Pişt re jî dibêjin "Em bi terorîstan re şer dikin." Hûn van hovîtiyan jî bi sîlehên alman û bi perçiqandina peymanên navneteweyî dikin. Ez nikarim ji we re bibêjim hûn bi xêr hatin."

**ÎSKANÊ HENÊ**



**Li Dusseldorfê meşeke ku wê qet neyê jibîrkirin li dar ket**

# 60 hezar mirovên Kurdistanî îşgal protesto kirin

Kurdistaniyan roja 1'ê avrêlê, îşgala dewleta tirk a başûrê Kurdistanê li bajarê Dûsseldorfa Almanyayê bi meş û mîtîngekê protesto kirin.

Ji bajarên cur bi cur yên Almanyayê, nêzîkî 60 hezar kesî, li kolanên li Dûsseldorfê ji bo protestoyê li hev civiyan. Di meşê de bi îmzeya nûneriya ERNK'ê yê Ewrûpayê bi almanî û tirkî belavokek hate belavkirin. Posterekî mezin yê Serokê Giştî yê PKK'ê û bi dehezaran alên ERNK'ê di meşê de hebûn. Meşvanan di meşê de sloganên wekî: "Bijî PKK, Bijî Serok Apo, Bijî Gerîla" hatin avêtin. Pankartên wekî; "Qetlîma dewleta tirk bidin sekinandin, Tirkiye dikuje, Yekitiya Ewrûpayê lê temaşe dike. Bijî PKK, ERNK, ARGK." bal dikişandin ser xwe. Meşa ku diirêjiya kurteja wê ji 2 km'yan zêdetir bû, heta meydana mîtîngê dom kir û li meydanê bi axaftin, şano û dîlanan qediya. Axaftaran gotin ku PKK hêviya gelê kurd e û xwestin ku qedexeya li ser PKK'ê bê hildan.Polîsên alman di meş û mîtîngê de mûdaheleyî beşdaran nekirin û mîting bêbûyer xelas bû.

Eynî rojê, li Parîsê jî, zêdeyî 5 hezar Kurdistanî, îşgala komara tirk ya li başûrê Kurdistanê bi meşekê protesto kirin. Di meşê de, bi axaftin û sloganan îşgal hate protestokirin.

Li Îtalyayê jî, komek parlementerên îtalyanî, ji bo ku qetlîamên Kurdistanê protesto bikin, pazûbendên reş li milê xwe girêdan û çûne parlamentoyê.

**Welatê Me/ Kurd-A**

# 'Hûn bi xêr hatin parlamentoya me'



Zübeyir Aydar



Ali Yiğit

Ji 3'yê avrêlê bi vir ve, endamên Komîsyona Amadekar ya Parlamentoya Surgunê a Kurdistanê, Ali Yiğit û Zübeyir Aydar, li Portekizê hevdîtinan li dar dixin. Yiğit û Aydar gava ji bo hevdîtinê çûne parlamentoya Portekizê, ji aliyê Serokê Komisyona Derve yê Parlamentoya Portekiz ve bi merasimekê fermî hatin pergandin.

Piştî pergandinê, Serokê Komîsyonê û li ser navê hemû partiyan, 23 parlementeran bi Yiğit û Aydar re civînek çêkirin. Di civînê de, Serokê Komisyona Derve Antonio Percira, got ku, "Kurd gelek ji yên herî kevnare ye lê gelek caran hatiye qetilkirin. Em îro bi hatina nûnerên gelê kurd şad bûne. Komîsyona me, îşgala başûrê Kurdistanê protesto dike û li nûnerên kurdan silav dike. Hûn bi xêr hatin parlamentoya me." Piştî vê axaftinê, Zübeyir Aydar, der heqê tevgera azadiya Kurdistanê û hovîtiya komara tirk de nêzîkî nîv saetê agahî dan komîsyonê. Piştî axaftinê Aydar pirsên parlamenterên portekizî bersivandin.

Çapemeniya Portekîz jî eleqeyeke mezin nîşanî nûnerên Parlamentoya Kurdistanê ya li surgunê da û bi wan re hevpeyvîn hatin kirin.

**Kurd-A/ Welatê Me**

www.arsivakurdi.org

GÜNLÜK GAZETE

yeni politika

10 NİSAN 1995 ÇARŞAMBA

YIL: 1 SAYI: 1 15. 000 TL

## Dijbereke rojane tê nava me

Di vê heftiyê de, rojnameyeke dijber silav li kesên dijber ên pergalê dike. Lewre Xwedî-îmtiyaz ê rojnameyê Necati Taniyan dibêje ku, ew hemû kesên ku gilî û gazinên wan ji polîtîkayên dewletê hene, ji xwe re wekî girseya hedef dibînin.

Erê, kî ji ber pergala kemalîst û kirinê wê ne xweş be, wê karibe daxwazên xwe di rûpelên vê rojnameyê de bibîne.

Rojname wê ji 14 rûpelan pêk bê. Ji rûpela medyayê heta bi ya karker û xebatkaran, ji rûpela dinyayê heta bi ya ekonomiyê; wê cih bidin gelek mijar û qewmînan.

Ji heftiyê du caran wê rengîn derkeve; rojên şemî û yekşemê. Her wiha rojname wê di eynî rojê de li Frankfurta Almanyayê jî bê çapkirin. Li Tirkiyeyê jî, li Stenbol û Edeneyê. Rojname heta dema çapê, wê hemû amadehiyên xwe li navenda xwe bike.

Ev rojnameya nû, bi teknîkên nû hatiye arastin. Li Amedê, Mezrayê (Elezîzê), Agiriyê, Êlihê (Batmanê), Ruhayê, Mêrsînê, Edeneyê, Enqereyê, Îzmîrê û li Samsûnê buroyên xwe vekirine. Tevîhev ji 200 kesî bêhtir xebatkar didine xebitandin.

Xebatkar, li gorî ku dadixuyînin, berê jî di rojname û kovarên dijberî pergalê (sîstemê) de xebitîne û pisporên karên xwe ne.

Di nava kadroya nivîskarên rojnameya rojane de, mirov rastî navên naskirî tê: Server Tanilli, Vedat Türkali, Eşber Yağmurdereli, Münir Ceylan, Hatip Dicle, Sibel Özbudun, Demir Özlü, Mihri Belli, Orhan İyiler û hwd...

Yeni Politika herî dereng wê di nîvê pêşîn a vê mehê de derkeve. Em ji niha ve jê re dibêjin: "Tu bi xêr û xweşî hatî nava me Yeni Politika."

### Xwedî-îmtiyaz yê Rojnameya Yeni Politika Necati Taniyan:

# 'EM DIXWAZIN TEVGERA AZADIYÊ BIDIN NASÎN'

*Li welatên ku lê demokrasî heye, çapemenî mîna hêza caremîn tê pejirandin. Piştî hêzên qanûnçêkirinê, birêvebirinê û daraziyê, ew tê.*

*Lê, heke çapemenî serbest û azad be, ev rewş tê pejirandin. Gelo, li Tirkiyeyê behsa çapemeniyeke azad dikare bê kirin? Em bersiva vê pirsê, em ji we xwendevanan re bihêlin.*

*Baş tê zanîn ku çapemenî ji kar û barên hikûmetê gel agahdar dike, wezîfeya çav, guh, dev, ziman û hwd. ên gel dinimîne (temsîl dike).*

*Îro li vî welatî rojname tên weşandin, "bi nav û xetên weşanê yên ji hev cihê." Lê tev, ji hev hîç necudatir in. Kirasên wan ne nola hev e, ewqas. Ên di binê kiras de eynî ye. Navê dijberiyê li xwe dikin, hew. Bi yek dengî kirin û siyasetên li dijî kulturên cihê, hindikahiyên olî (dînî), etnîkî... diparêzin. Armanca tevan, hêvişandin (muhafazakirin) û parastina yek kultur, yek miletî ye. Bi gotineke kurt û tijî mane, "Tirkiye ya tirkan e" besmeleya wan e.*

*Divê bê gotin ku, rojnameyên rojane û bi rastî dijber jî, derketin. Lê berdêleke gelek giran dan. Hatin kuştin, bombekirin, girtin. Gerewa (berdêla) xebata xwe ya mirovane dan. Özgür Ülke û Özgür Gündem, nimûneyên herî balkêş in di vî warî de.*


*Niha jî rojnameyeke din, bi navê Yeni Politika dike derkeve. Ew jî xwe ji sîstema kemalîst re wekî muhalîf diyar dike. Xwediyê wê yê îmtiyaz Necati Taniyan e. Bi xwe Gurcî ye. Di çapemeniyê de bi navê Tanto Îmer jî tê naskirin. Em beriya ku rojname dest bi weşanê bike pê re peyivîn.*

**Îro li Tirkiyeyê gelek rojnameyên rojane hene û hûn jî haziriya weşandina hebeke din dikin, ji ber çi?**

– Heke em avakirina Komara Tirkiyeyê bi vekirina Meclîsa Tirkiyeyê dest pê bikin, ev 75 sal in ku, li welatê me der heqê fikir, bîr û bawerî, çapemenî, weşan, vegotin, zanist, hindikahiyên etnîkî de, serbestiya organîzebûnê nîn e. Her tişt tek hatiye dîtin, tek partî, tek kultur, tek netewe, tek mezheb û hwd.

Sendîka nîn e, komele nîn e. Ev di dema Osmanî de hene, lê di dema komarê de nîn in. Ez ne şaş bim cara pêşîn, der barê sendîkayan de xebat di salên 1950–51'î de çêdibin. Bi kurtasî, serbestiya organîzebûnê nîn e.

Der barê çapemeniyê de jî çend ceribandin hene ku li derveyî îdeolojiya dewletê ya resmî dest bi weşanê kirine. Beriya salên 1950 Rojnameya Tan, di salên 70'yî de Yeni Ortam û beriya 80'yî Rojnameya Demokratê. Em dibînin ku ev rojname jî hatine rû-



Avahiya Yeni Politikayê; di vir de ji sedî bêhtir kes dixebitin. Rojname ji bilî çapê, hemû karên xwe yên weşanî tê de amade dike.

www.arsivakurd.org

xandin (îmhakirin).

Di van demên dawî de hewl û pratîkên rojnameyên Özgür Gündem û Özgür Ülkeyê hene. Ev rojname ji bo ku polîtîkayên dewletê yên red û înkarê, ji holê rakin xebitîn. Ev jî tê zanîn, ew rojname ji ber polîtîkayên şîdetê yên dewletê an mecbûr man weşana xwe bidin sekinandin, an jî hatin girtin.

Ev rojnameyên ku niha tên weşandin, hemû di bin emrê dewletê de ne û berdevkiya wê dikin. Lê bi hindikahî be jî, li gorî pîvanên welatên medenî îhtiyacî bi çapemeniyeke azad, serbixwe û demokrat heye. Ji ber van sedeman em derdikevin û derketinê wekî wezîfeyekê dibînin.

**Hûn bi vê rojnameyê dixwazin xwe bigihînin kîjan girseyan, deng li kê bikin?**

– Belkî gotinên min bi awayekî bi ser re bin, em dixwazin xwe bigihînin wan kesên ku xwe der barê fikir, bîr û bawerî, vegotin, çapemenî, weşan, zanist û hindikahiyên etnîkî de, bi rê nexistine, bêteşkîlat mane. Di vê navê de em deng li karker, xebatkar, gundî, esnaf, karmend, teqawid û hwd. jî dikin. Heke kin were gotin em girseyeke pir fireh didine ber xwe û em dixwazin xwe bigihînine wan. Bi kurtasî emê ji mirovên ku tengasiyên wan hene re bibine neynik (eynik).

Emê bibine rojnameya kesên ku, bi riya demokratîk dixwaze mafên xwe yên bingehîn bi dest bixe. Emê di warê çapemeniyê de bidine zanîn ku, divê êdî polîtîkaya dewletê ya red û înkarê ji navê bê hilanîn. Jixwe êdî ne mumkun e ku ev polîtîka bidome. Divê yên ku jê tesîr standine bi hişên xwe ve werin, bêne ser kok û eslên xwe.

**Hûn xwe wekî rojnameyeke dijber (muhalîf) didine xuyakirin û hûn dixwazin bi vî wesfê xwe têkilî bi qonaxê (pêvajoyê) bikin. Hûnê karibin çiqas bandorê (tesîrê) lê bikin?**

– Em diçin û tên rastî polîtîkaya red û înkarê ya 75 salan tên. Ji bo ku ji vê red û înkarê gel bê filitîn, di binê pêşengiya gelê kurd ê bira de, xebatek heye. Em dixwazin vê tevgera azadiyê bi mirovan bidine nasîn. Divê em wan pê serwext bikin. Xebat mîna bûyereke terorê tê navandin. Gelek, ne mumkun e ku bi tevahî terorîst be, jixwe nabe debaşa mijarê (mewzûya behsê) jî.


Ez bi xwe Qertvelî me, her çiqas bi qasî kurdan nebe jî, gelşên me jî hene. Divê em van jî bidine gotin, bi mirovan bidine fêmkirin. Navê cih, dever, çiya, gund, bajaran hatiye guhartin. Qala 37 an jî 27 hindikahiyên tê kirin. Li Tirkiyeyê nayê zanîn ku ka çiqas hindikahiyên ku ji neteweyên cur bi cur in hene. Niha bi înkarkirina van heqîqetan, redkirina wan, bi bêşexsiyetkirina mirovan tu kes nikare xwe bigihîne cihekî.

Emê van mijaran bi riya çapemeniyê derxine rojevê û bidine munaqeşekirin.


**Hûn bawer dikin ku hûnê karibin bi rihetî bixebitin û weşana xwe bigihînin girseya ku hûn deng lê dikin?**

– Pratîka rojnameyên dijber li ber çavan e. Ji rojnameya Tanê heta bi Özgür Ülkeyê. Niha jî em derdikevin. Em dev ji xeta xwe ya dijber bernadin û em bibiryar in. Em dizanin ku wê dijwarî û tengasiyên me çêbibin. Em bi destûran naxebitin û rojnamevantiyê nakin.

**AYNUR BOZKURT**
**ZANA FARQÎNÎ**







**NECATÎ TANÎYAN**

"Ez zarokê wê deverê me ku, navê bajarê wê, qezaya wê, nehiyeya wê û gundê wê hatiye guhertin. Lê belê, ji bo ku hûn fêm bikin ezê navên wan ên nû bibêjim ku 75 sal in wiha tên zanîn. Ez ji Artvînê, navçeya Şavşatê, nehyeya Meydancikê, ji gundê Madenê me. Ez Qertvelî me, li Tirkiyeyê bi navê Gurcî tê zanîn. Min 28 sal mamostetî kiriye, ev sal û nîvek e ku, ez ji karê xwe teqawid bûme. Em ji binemaliya xwe ve li Artvînê ne. Bi gotineke din em xwecihên wê deverê ne. Ji sala 1921'î bi vir ve, ji ber peymana di navbera Komara Tirkiyeyê û Sovyetê, em li vî aliyî mane û bûne hemwelatiyê tirk. Tabî, gelê me wê çaxê xwestiye li aliyê Tirkiyeyê bimînin."

**Neteweyek bi axa xwe, dîroka xwe, ala xwe û bi zimanê xwe serbilind e. Îro em dinêrin axa me di bin lingan de ye. Dîroka me ji aliyê dijjmin ve tê nivîsandin. Sê rengên ala me qedexe ne. Ji bo me çi dimîne ? Bê şik ziman dimîne. Lê xwedê zane gelê biyan nayên û li zimanê me xwedî dernakevin. Divê gelê kurd lê xwedî derkeve û pişta xwe bi destê xwe bixwirîne.**



# KURDÎ Û EHMEDÊ XANÎ

Wekî ku tê zanîn sala 1995'an ji aliyê rêxistinên kurd ve wekî sala Ehmedê Xanî hate diyar kirin. Ev biryar ji bo wêje û çanda kurdî tiştekî pir girîng e. Ji kurdên xwenas re jî tiştekî gelek balkêş e.

Pêşketin û pêşveçûna gelan bi saya çand û wêjeya wan dibe. Çand û wêje jî bi saya rewşenbîr, nivîskar û helbestvanan bi pêş dikeve.

Gelê Kurd di vê mijarê de gelekî li paş maye. Çand û wêjeya kurdan ya kevnare ku bûye bingeha çand û wêjeya Mezabotamyayê, lê ew ji bo çi wiha di tariyê de maye? Mixabin ji destê wan nezanên ku xwe rewşenbîr nîşan didin. Ewên bi eslê xwe kurd lê bi mêjiyên xwe tirk, ereb û ecem in. Dema ku em li ser van dihizirin mezinahî û dilovaniya Ehmedê Xanî hê bêhtir xwe nîşanî me dide

Hevdemên Ehmedê xanî ji bo ku kîsikek zêr (pere) bistînin an jî pesindanekê wergirin, terî li ber şah û padîşahan dihejandin. Hemûçikan di baxçeyê kurdî de mîna stirî û qûncirê şax veda bûn. Lê Ehmedê Xanî di nava wan de guleke sor û geş bû. Wî dest avête zimanê xwe yê delal û berhemên xwe yên bêhempa bi vî zimanî nivîsîn

Neteweyek bi axa xwe, dîroka xwe, ala xwe û bi zimanê xwe serbilind e. Îro em dinêrin axa me di bin lingan de ye. Dîroka me ji aliyê dijjmin ve tê nivîsandin. Sê rengên ala me qedexe ne. Ji bo me çi dimîne? Bêşik ziman dimîne. Lê Xwedê zane gelê biyan nayên û li zimanê me xwedî dernakevin. Divê gelê kurd lê xwedî dekeve û pişta xwe bi destê xwe bixwirîne. Êdî bila her kurd bizanibe ku ziman namûs e, ziman şeref e, ziman dayik e, ziman yar e. Kesê ku bêziman be ji hemûçikan bêpar e.

Ehmedê Xanî ne bi salekê, wê her dem ji aliyê gelê kurd ve bê bibîranîn. Careke din xuya dike ku mirov bi eslê xwe ser bilind dibe. Ne bi mandilekirina eslê xwe.

Divê em vê jî bizanibin ku kesê nivîskar incex bi zimanê xwe dibe rewşenbîr an na wê bibin rewşenbîrên sexte.

Di dawiya nivîsa xwe de li ser vê mijarê ez dixwazim helbesteke xwe pêşkêşî xwendevanan bikim:

**KURDIYA MIN**

Kurdiya min
Deryaya bêbinî
Şana hingivîn
Şana devê min
Riya min a bêdawî

Bi te radizêm
Radibim bi te
Bi te ye girî û şîna min
Ken û şahiya min bi te ye.

Kurdiya min
Zarê zêrîn
Bi te ye strana min
Qîr û hawara min bi te ye
Û bi te ye sond û peymana min
Hêrs û berza min bi te
Bihar bi te ye
Bihara min
Bi te reng didin
Kesk û sora û zer
Bi te dihele
Roja min
Heyva min bi te

Kurdiya min ala min
Olê min
Tu ne bûya kî bû Ehmedê Xanî
Çi bû Mem û Zîn
Kê nas dikir
Meleyê Cizîrê û Feqiyê Teyran
Wê winda bûya Elî Herîrî
Nalî û Qedrîcan
Wê mandile bûna kurd
Wê tunebûya Kurdistan

Îro bi te diherike
Dîcle,
Ferad
Bi te pêlan dide.
Û bi te dijwar e Xabûr
Bi te bilind in
Cûdî û Gabar
Bi te geş in
Amed
Dêrsim
Û Mehabad

Îro
Di bin lingan de ye axa pîroz
Winda ye dîrok
Tar û mar e çanda geş
Tu tenê mayî
Kurdiya min
Diya min
ji te çêbûm
heme bi te
Û bi te dimirim.....

**JÎR DİLOVAN**

## DEFTER

### Ji zarokên xwe re vê nameyê dişînim



DILBIXWÎN

De megirî kurê min, li ser çi, ji ber çi digirî. Ez dizanim, canê te yê teze nikare barê bomba û fantoman hilgire. Min ji bîr nekiriye, tu her roj mîna gulekê li pêşiya çavên min î. Carekê ez rûyê te li Helepçeya şewitî dibînim, rojekê ez dilê te li kolaneke Şirnaxê di nava gul û gupikan de dibînim, rojekê jî ez li Cûdî, Gabarê, li Kela Memê te di bin sandiqên fişekan de dibînim. Belê li ser pişta te tenekeyên penêr û helawê dibînim, meraq neke pêdivî nîn e tu ji min re riya xwe nîşan bidî, ez baş dizanim tu wan tiştan ji kê re dibî. Wê li wan qutaran ji bilî "zarokan" kî hebe?

Dilê te dixwaze tu ji însanan re gelek tiştan bibêjî, baş e, lê belê kanî ew însanên ku tu ji wan re çîroka êş û kedera xwe bînî zimên. Diyar e ku te hîna ev dinyaya em tê de ne nas nekiriye. Ax xwezî te rastiya wê bizanibûya, hingê belkî ev hesret di nava hinavên min de nedima. Bi rastî min nedixwest van hêstiran di çavên te de bibînim. Lewre hîna temenê te biçûk e, ji niha ve xwe hînî girî neke, gelekî dijwar e. Were ji kerema xwe re carekê çîroka jiyana bavê xwe bixwîne, em çendî giriyan, çendî koçber bûn, çendî em li ser devê riyan birçî tazî, bêban û bêkes man! Ne mîna hêstirên di çavên te de, em di gorê de jî giriyan, hîna ew wêne wekî ewreke kîndar li pêşiya çavên min in, tu dibêjî qey dixwaze laşên mirî bi ser min de berde. Te hîna tiştek nedîtiye.

Rast e, tu diêşî, ez jî bi te re diêşim. Barê bombayan ne sivik e. Tu jî dixwazî mîna zarokên din, ji şer dûr jiyan bibî, mafê te ye, ne tenê tu, ez jî dixwazim, lê hema çare çi ye? Min ji te re got, negirî, tu caran ew birîna di kezeba te de derman nake. Nenale, ew li ber nalîna te direqisin. Destê xwe li ber wan venegire, ew destên te yên teze û nazik dişewitînin... Tu niha ji min riya çareyan bixwazî, belê ez tenê vê ji te dixwazim: Li ber xwe bide! ji berxwedanê bêhtir tu nikarî tu riyan bibînî. Ji bîr neke, eger tu li ber xwe nedî û ji xwe re nebî piştek, wê wekî ku anîne serê me, bînin serê te jî.

Ne tenê îsal, her sal ew balafirên xwe difirînin. Her sel çiya, zozan, deşt û newalên me dişewitînin. Ev ne cara yekemîn e ku em koçê diavêjin ser milê xwe û berî didin çol û çiyan. Qet xwe nêeşîne, dilê xwe teng neke, negirî jî, bila kesek xwe di nava hêstirên te de neşo, kêfa kesekî bi xwe xweş neke. Wekî ku min ji te re gotibû, tenê welat, gel, xaka xwe biparêze û heya ku tu dikarî li ber xwe bide.

Ez vê nameyê ji te re dişînim, lê belê ji hemû zarokên Kurdistanê re bixwîne. Dema ku te name xwend bila her kes dengê te bibihîse. Qet ji kesekî netirse, di bin topan de be jî, dîsa bixwîne, ji xwe di bin topan de me jiyan nas kiriye.

Çavên hemû zarokan ji ber min ve ramûse. Ez li benda dengê te me.

www.arsivakurd.org

SERPÊHATIYEKE JI RÊZÊ JI JIYANA KARKERÊN PEMBÛ

# EVÎNA REMO Û EYŞÊ Û KARÊ PEMBÛ

Dengê melayê sibê ji ber bayê xurt geh nizim, geh bilind dibû. Ev dengê zîz ji mizgefta Mazilevdîn li asîmanê bajêr belav dibû. Wî xewnên berbangê nîvrê dihişt. Li pey hev lembeyên malan vediketin. Bermaliyan êzing dixistin sobeyê. Bi beroşê av datanîn ser sobeyê. Hem ji bo abdestê (desmêjê) û hem ji bo şorbenîskê... Heta çavan erd bidîta banga dîkan ji pey hev qut nedibû.

Karkerên daneheva pembû li bêndera tenişta pirê dicivin. Li benda trektorê bûn. Tîqetîqa wan bû. Hê ku roj ne hilatî diviyabû li nava zeviyan bûna. Karkerên zarok mîna pisîngan xwe dipernisandin, guh û pozên wan sor dibûn. Destên xwe kiribûn binçengê xwe û çavên wan li riya ku trektor jê tê bû.

**Remo û Eyşê**

Ji dema ku evîna Eyşê ketibû dilê Remo ve, Remo hatibû guhertin. Ew Remo çûbû yekî din hatibû şûna wî. Êdî ne henek û ne gemşandin dikirin. Carê dema firavînê bi hevsalên xwe re bi gemşa dilîst. Ji bo ku pê bikenin, qeşmerî dikir. Niha wekî kevirekî di guhê gundikî de dijî, wilo bêpêjn... Gelek caran helawa ku ji sûkê dikirî, nexwarî vedigerand mal.

Wexta ku keç û lawan stran li hev vedigerandin rûyê Remo sor dibû, ji şermkirinê. Di bin çavan re li Eyşê dinêrî. Carinan çavên wan li hev diket. Eyşê dikenî. Du kortik li rûyê wê çêdibûn. Bi lez berê xwe diguhert.

Êdî Eyşê dizanibû dilê Remo tê de heye. Li xweşiya wê jî diçû, dixwest Remo lê binêre. Belê tirsa wê ew bû ku birayê wê yê jê biçûktir bibîne an jî hin kes seba wê li cem bavê wê bikin.

Remo pir difikirî. Digot: "Ezê çawa êşa dilê xwe ji Eyşê re bibêjim? Ev derd di dilê min de bûye bizotek. Dilê min kul bûye, birîn bûye. Divê were kewandin."

**Orkestraya karkeran**

Êvar, ji birînan re derman e. Tarîbûn, wekî kulmek dasî wê bikeve gewriya birîndarê xedar, xwe bêînsaf bi ser erdê de berdide.

Trektora ku karkerên pembû tîne, li ser riya qîr (asfalt) dike teq û req. Dilê karkeran tê ber devê wan. Romorka trektorê wekî deydîkê diheje. Dengê motora trektorê, teqûreqa tekelan û keçikên ku payîzokan dibêjin, wekî orkestrayeke xerabûyî derdikeve.

Kebanî an jî sermiyanê malê dibêjin: "Mela dike ku banga eşayê bide. Lê hêj zarok venegeriyan. Xwedê bike tu bela nehatibin serê wan."



Belkî ev diaya jor, bû hezar car ku di vê wextê şevê de tê kirin... Lê qinyat ji mirovan re dermanê herî mezin e.

Sobeya tenekeyî sincirîbû. Bêhna agirê dara berûyî di odeyê de belav dibû. Eyşê di bin şewqa lembeya melûlî de destmalek dineqişand. Reng û şiklê evîna ku ji dilê wê dihat xwe berdida ser etamînê spîçolkî. Diya Eyşê, serê neviyê xwe danîbû ser kaba xwe, ji aliyekî ve jî çîroka Mirze Mihemed digot.

Eyşê jî guh dabû ser çîrokê. Di dil de xwe û destgirtiya Mîrze Mihemed, Remo û Mîrze didan ber hev. Saet hat 10 û nîvê şevê. Eyşê li ber çîrokê diponijî...

Ji karkerên pembû re roj tev wekî hev in. Tiştê tê guhertin navê rojan e û hejmara emrê mirovan. Remo dest û rûyê xwe bi ava mûslûxa di hewşê de şûşt. Hat hundir, çû ber neynika daliqandî sekinî. Pizrika ku li hinaroka rûyê wî daye der, guvaşt. Porê xwe bi paş ve şeh kir. Hinek lewante li rûyê xwe kir. Çavên wî, rûyê wî yê biken dîtin di neynikê de. Keserek veda. Tûrikê vexwarinê kire bin çengê xwe û bi lez ji mal derket. Ser nixûn difikirî: "Evîna Eyşê wekî kurmekî di nava min de ye. Dixwazim derdê xwe jê re bibêjim, lê dema ku ez qerarê didim û ber vê diçim; çokê min dişikên, dest û lingên min diricifin. Dilê min dike kute kut. Ev bû çend car ku ez êvarî dibêjim ku bibe sibe, ezê bi Eyşê re biaxivim." Lê gava ew nêzîkayiyê li Eyşê dike bêhna wî tê çikandin, dest û lingên wî diricifin. Neçar, vedigere. Bi hêviya careke din dijî.

Gava Remo gihîşt hola ba pirê, dît ku karker tev li hev civiyane. Hinek dikin kurtepist. Qemyon û trektorên ku karkeran dibin ser zeviyan gişk vala sekinîne. Remo got: "Gelo çi bûye, çima karker li erebeyan siwar nebûne; kî zû bigihîşta cem erebeyan, ji xwe re qorzîk digirt."

**"Bila kes neçe pembû"**

Remo hat ba Xelîl. Rojbaşek da û bi telaş pirsî: "Birayê Xelîl xêr e, çima milet li hev kom bûye?" Xelîl di bin simbêlê xwe yê zirav de kenî, got: "Were em ji xwe re li vê enîşkê li ser lingan hinekî biaxivin." Xelîl û Remo ji nava karkeran derketin. Çûn li enîşkê sekinîn. Remo pir meraq dikir. Di dilê xwe de got: "Gelo qey dîsa hinek xayin li ser pirê hatine kuştin, an jî qaçaxçî (revok) hatine kuştin, mayin teqiyaye, eskeran rê birîne, çi bûye?" Xelîl bi lez û heyecan got: "Ma çi feyde tu negihîştî serî. Çend telebe (şoreşger) hatin. Gotin, Bila tu kes îro neçe kar. Heta ku heqê daneheva kîloyek pembû nebe banqinotek, kar qedexe ye? Çawîşê ku karkeran bibe xebatê dê ceza bide. Serê her karkerekî jî belavokek danê."

**Heqê daneheva pembû**

Xelîl belavoka ku bi deqtîloyeke baş nehatiye nivîsandin, ji bêrîka xwe derxist, da Remo. Remo, li belavokê nêrî. Lê xwendin û nivîsandina wî bibêje hema tunebû. Dîsa li Xelîl vegerand. Karkerên ku lepik kirine destê xwe û poşî li serê xwe girêdane, di kolanên Nisêbînê yên bi herî re vedigeriyan malên xwe. Gengeşî dikirin. Hinekan digot: "Çi serê telebeyan ji heqê daneheva pembû diêşe. Em kîloyê bi çi diçinin, emê biçinin. Ma mîrê kêfa me ne." Hinek jî bi van gotinan aciz dibûn, digotin: "Kuro qencî ji we re ne lazim e. Telebe xwe ji bo we diavêjin talûkeyê (xeter), da ku sîgorta me çêbibe û em wekî însanan bijîn. Hûn dibînin em ji sibê heta êvarê dixebitin. Lê heqê kîloyek goşt jî di destê me de namîne. Ma ev hal e. Jiyana me riswa ye. Ji çawîşan re ne xem e. Hem ji xwediyê pembûyan, hem jî, ji me heqdestê (rojana) xwe distînin. Lewma ew hevalbendiya axayan dikin. Dema qîçek pembû bi guzikan ve dimîne qîr dikin me."

**Roja paleyan erzan e**

Çend rojan karker neçûn kar. Dawî xeber hat: "Xwediyên pembûyan heqê berhevkirina kîloyek pembû kirine banqinotekê. Êdî li navçeyê slogana ku karkerên pembû digot ketibû devê zarokan: "Roja paleyan erzan e, heqê kîloyek bacan e."

Wê rojê Remo sond xwaribû, ku derdê xwe ji Eyşê re bêje. Di dilê xwe de got: "Ziravê min ji pisîngê, yê pisîngê ji min." Wekî hemû rojan karkeran xwe amade kirin. Ji bo ku di rojeke seqemî de gelek pembû bidin hev, da ku cejnê kincan bidin dirûtin. Tûrikê xwarinê kirin bin çengên xwe û dan rê. Wekî hemû rojan, hola li tenişta pirê bi deng û awaz bû. Ji deh metreyan dûr ve karkeran henek li hev dikirin. Karkerên zarok berê xwe didan roja nû derketî. Da ku dilkê wan yê biçûk û destê wan hinekî germ bike.

Gava trektora ku Remo û Eyşê lê siwarbûyî di ber dibistanê re borî, xwendekaran marş dixwend: "Türküm, doğruyum, çalışkanım..."

Karkerên zarok bi kêf û bi awayekî balkêş li xwendekaran nêrîn. Ji karkeran yekî ku bi tirkî zanibû got: "De li derewan binêre. Hêj bi tirkî nizanin, dibêjin tirkim, doxriyim..."

Remo got: "Êvar û tarîbûn; kêmasiyan, bêbextiyan û qirêjiyan vedişêre. Ez bawer im ku ew dê tirsa dilê min jî veşêre. Wexta em êvarê vegeriyan, di çûna riya mal de ezê bi Eyşê re biaxivim."

Ev neh saet in ku dixebitin. Roj çûye ava. Çawîş got: "Ez heyrana çavên we me. Vê golikê jî biqedînin. Da sibe em herin ser zeviya jêrîn."

Wexta karkeran, pembûyê xwe pîvan ji zû ve mele banga muxrubê dabû. Qêrîn û qajîna çawîş û yên karkerên di vê şeva tarî û seqemî de digihîştin gundê wî aliyê têlê (Suriye– kurdên başûr).

Dengê nobedarê tixûb dihat. Straneke zîz bû. Mirov texmîn dikir ji hêla Behrareşê ye...

"Çarşambayı sel aldı
Bir yar sevdim el aldı."

**Evîna binê qenala avê**

Xalê Evdî got: "Lawo ma çi li te qewimiye. Çi karê te li vê derê heye. Here mala xwe li cem sobeyê, li kêleka dê û bavê xwe rûnê. Trektor hêdî hêdî ber bi Nisêbînê ve dihat. Çirayên minareya mizgefta Mazilevdîn yên melûl û çirayên bajarên Qamişloyê diçirisin.

Heta ji şifêr dihat dilezand. Da ku karkeran zû bigihîne mal Romorka trektorê tijîbû. Karker di dawa hev de rûniştibûn.

Ji nişka ve şifêr qîr da, fren qetiyabû, trektor bi vir de hat, bi wir de çû. Hinekên kal selewat xwendin. Belê şifêr dîreksiyon zeft nekir. Trektor di qenala tijî av de wer bû. Qîrên karkeran li asîmên diket.

Evîna Remo û Eyşê ketibû binê qenala avê. Êdî ew evîn di wir de veşartîbû. Niha li wir şikêrek heye. Li ser şikêre darek şîn bûye. Yên evîndar û keserkûr diçin terîşên rengereng bi wê darê ve dikin. Bi hêviyeke xurt, bi hêviya ku daxwaza wan were cih, vedigerin.

HESEN ZINAR



## Ji mîtolojiya gelê kurd nimûneyek:

# Qereçarşema serê zîpan

**Li gorî baweriya vê efsaneyê, Şahmaran di Qereçarşema pêşîn a zîpan de diçe mala bavê xwe zehî. Zehîtiya wê jî salê carek e. Di vê çarşemê de divê kes li hev nexin, dilê hev nehêlin û rika xwe nedine hev. Nexwe heta sala din wê çaxê, wê ew rewşa wan a neyartiyê bidome. Dîsa li gorî baweriyan, dema ku Şahmaran diçe zehî, heke dinya xweşî be, dawa wê berdayî ye û ji ber vê rewşê mar jê dikevin ser axê. Ew sal mar pir in. Lê ku dinya şilî be, Şahmaran bi piyên tazî û dawhildayî diçe zehî. Wê gavê têjik (çêjik, çêlik) jê nakevin û ew sal mar hema bibêje nîn in.**

Ezê rasterast behsa Qereçarşema serê zîpan bikim. Şîrovekirina wê jî, ji pisporê mijarê re dihêlim.

Di salê de, sê çarşemên zîpan hene. Yek jê di heftiya dawiya meha reşemiyê (sibatê) de ye û dudu jî, di herdu heftiyên pêşîn ên meha adarê de ne.

Gerek e ev jî bê gotin ku, li gorî salnameya rûmî ev tên hesibandin. Di navbera teqwîma rûmî û mîladî de 12 roj ferq heye. Teqwîma mîladî 12 rojan li pêşiya ya rûmî ye.

Li gorî baweriya vê efsaneyê, Şahmaran di Qereçarşema pêşîn de diçe mala bavê xwe zehî. Zehîtiya wê jî salê carek e. Di vê çarşemê de divê kes li hev nexin, dilê hev nehêlin û rika xwe nedine hev. Nexwe heta sala din wê çaxê, wê ew rewşa wan a neyartiyê bidome.

Dîsa li gorî baweriyan, dema ku Şahmaran diçe zehî, heke dinya xweşî be, dawa wê berdayî ye û ji ber vê rewşê mar jê dikevin ser axê. Ew sal mar pir in. Lê ku dinya şilî be, Şahmaran bi piyên tazî û dawhildayî diçe zehî. Wê gavê têjik (çêjik, çêlik) jê nakevin û ew sal mar hema bibêje nîn in.

**Xwezîpkirin**

Di her sê zîpan de gel bi gotinên li jêrê xwe zîp dikin û xwe ji belayê diparêzin.

*Zîp, rîp, gîp*
*Jan, jû, êş, elem*
*Tev çûn bi ava çem de.*

Xwezîpkirin jî, bi vî awayî çêdibe. Ew gotinên li jorê sê caran têne gotin û porê wî/wê kesî/ê tê jêkirin.

Her wiha gel pûrta heywanên xwe jî dibirin, dirêsin û dibin cem meleyekî, seydayekî û pê de didan xwendin. Da ku pêz û dewarên xwe jî, ji êş, bela, teşqeleyan bihêvişin (bixefirînin). Dema heywanekî gundiyan li çolê bimîne û neyê malê, gundî dîsa radibin diçin ba alimekî (ew kesên ku xwendina dînî li medreseyan xwendine) û "devê gur" girê didin.

Ji aliyê îklîmî ve jî, gel navê her sê heftiyan daniye "dema zîpan." Ji ber sar û sermaya wê jî vê gotinê dibêjin:

*Zîp e zîpedar e,*
*Bibare nebare xedar e.*

ZANA FARQÎNÎ

## SERBAZÎ WIN

Ke wefdê deçête şiwênê,
Bo ser gorî serbazî win,
Tace gûllîneyek dênê

Eger sibey,
Wefdêk bête welatî min,
Lêm bipirsê
Kwane gorri serbazi win?
Delêm
Gewrem
Le kenarî her cogeyê,
Le ser sekoy her mizgewtê,
Le ber dergay,
Her malê,
Her kilêseyê,
Her eşkewtê,
Le ser gaberdî her şaxê
Le ser dirextî her baxê,
Lem welate,
Le ser her biste zemînê,
Le jêr her geze asmanê,
Metirse! Kemêk ser daxe û
Tace gûllîneket danê...

**Abdullah Peşêw**

## SERBAZÊ WINDA

Ku heyetek diçe cihekî,
Ji bo ser gora serbazê winda,
Taca gûlîneke dibe.

Eger sibe,
Heyetek were welatê min,
Ji min bipirse
Kanî gora serbazê winda?
Ez dibêjim:
Mezîne min!
Di rexa her cohekê de
Li ser sekoya her mizgeftekê,
Li ber deriyê,
Her mal û
Her kilêseyê,
Li ber devê her şikeftê,
Li ser zinarê her çiyayî,
Li ser direxta her baxî,
Li vî welatî,
Li ser her bihusteke zemînê,
Li jêr her geze asmanekî,
Netirse! Hinek serî bitewîne
Taca gûlîna xwe dane...

**Werger: Sîrwan**

# AZADÎ

## Îskandînavya



**ABDURRAHMAN DURRE**

Bi kurtahî û vekirî, em dikarin bibêjin û îlan bikin ku doza kurd û Kurdistanê bûye rojeva hemû gelên cîhanê ku şanaziya gelê kurd e. Li her der û mekanê bexşîşa serhildan û şoreşa şehîd û xazî û şoreşvanên me ye. Ew ji bo me hemûyan mizgîniya zafera mezin e. Heta 15'ê avrêlê ( nîsan) wê Parlamentoya Kurdistanê li Mişextê eşkere bibe, televîzyona kurdî vebe, rojnameya me derkeve. Hêzên TC'ê yên faşîst wê li başûrê Kurdistanê perîşan û sernigûn di lîla (bataklık) bêumidî û bêçaretiyê de noq bibin, li ser dêv bikevin û herin. Gelên cîhanê wê li ber çavên xwe, mezinahî û zafera şoreşa azadî û demokrasî û mirovantiya gelê kurd bibînе û pê baweriyê bîne. Jixwe ku baweriya mirov bi mirov were, dinya hemû dijminê mirov be jî zafer ya mirov e. Hz Muhammed jî di gotinên xwe de gotiye ku bi rastî li ber bawerî û serhildana şoreşê tu hêz û tu quwetên din nikarin bisekinin û li ber dewam bikin, zafer ya şoreşê ye...

Xwedevanên hêja ev bû hefteyek ku li ser navê Parlamentoya Kurdistanê ya Li Mişextê (Surgun) em çend heval li welatên Îskandînavyayê; Swêd, Norwec û hwd. xebatê dikin û digerin. Bi partî, rayedar û şexsiyetên siyasî û rêzanî re, bi rojnamevan û televîzyonên wan re diaxivin, doza xwe ya însanî, demokratîk û neteweyî ji wan re dibêjin û daxwazên xwe pêşkêşî wan dikin. Bi rastî pir dîqet û bala wan di aliyê me de ye û ew baldarî roj bi roj mezintir û zêdetir dibe. Rewşeke wilo çêbûye ku hevpeyvîna bi me re tercihî hevpeyvîna bi dîplomatên tirk re dikin. Dîplomatekî îskandînavî ji me re wiha got: " Em bi Murat Karayalçın re neaxivîn, lê bi we re ji seatekê zêdetir e ku em diaxivin, êdî hûn ji me çi dixwazin?" Min bersiva wî da : " Aliyê guran mekin bes e! Hûn wan li hêviya gerîlayên Kurdistanê bihêlin, ew ji heqê wan derdikevin. Gur westiyane, birçî jî bûne, mirina wan nêzîk bûye, hûn silah û pereyan nedin wan, em di demeke nêzîk de hemû cîhanê ji barbarî û hovitiya wan xelas dikin. Hûn jî rihet dibin, em jî." Bi vê bersiva min, gelek kêfxweş bûn û keniyan. Yekî ji wan jî wiha got: " Rast e gur pir hov in, hem jî tirsonek in, ku tirs li wan ket, dest ji hev berdidin û direvin." Li ser gotina wî jî em hemû keniyan rojnamevanan jî (ev gotin) nivîsîn...

Xendevanên delal, bi rastî jî Îstandînavya pir xweş e, ya herî xweştir jî ev e ku li her derên wê, komel û buroyên Kurdistanê hene. Bi hezaran rewşenbîr û rêzanên azadiya kurdan lê dixebitin. Belê tu kes cihê şoreşvanan nikare tijî bike û nake. Em ji wan hemûyan re minetdar in.

www.arsivakurd.org

# Nimêja zilamê bêkêr



Li gundekî Kurdistanê du bira hebûne, çawa dê û bavê wan dimirin tu kesî wan namînê, herdu bira difikirin û dibêjin: "Ev e tu kesê me û tu tiştê me li vî gundî tuneye, pêwist e em herin ji xwe re li welatekî din bigerin." Herdu bira radibin tev ji gund derdikevin. Heya rojek, heftiyek, mehekê diçin. Li rasta çiyakî li wan dibe şev, wê şevê li şikeftekî dimînin heta dibe sibe. Roj diavêjê dinê, birayê mezin radibe deng li birayê biçûk dike: "De rabe vêca wext e, emê herin li ser riya xwe." Birayê biçûk radibe li dora xwe dinerê û dibejê: "Ma qey emê herin ku? Vî cihî xweş ne haya tu kesî ji me heye, ne tu tiştên nebaş lê hene. Emê li ve derê ji sibê heya êvarê nimêja xwe bikin û diayan ji Xwedayê xwe re bikin." Birayê mezin dibêje: "Na wele, ez namînim li vir, ezê herim ji xwe re feqetiyê bikim û bibime alim û kesekî zana." Xatir ji birayê xwe dixwaze û diçe li ser riya xwe. Birayê biçûk her roj radibe ji sibehê heta êvare nimêja xwe dike û dia ji Xwedayê xwe re dike, zêdeyî wê tu tiştî nake.

Rojekê serê sibê destmêjê digire, dinêre ku di bin oda wî de mişkek miriye. Ji xwe re difikirê: "Belki min ev mişk bi xeletî kuştibe, wê qetla wî bikevê sitûye min." Radibe wî mişkê mirî dixe nava şewqeya xwe û piştre nimêja xwe didomîne. Heta rojeke yekî gundî di wê derê re diborê silavê lê dike , silava wî digire, yê gundî jê dipirsê dibêje: "Ev çi ye." Zilamê me dibêje: "Hal û meseleya me ev e." Gundî bibêje ku di nav halê bêkêr de nimêjen wî hemû betal in. Zilam vê yekê qebûl nake. Gundî radibe dibêje: "Nexwe rabe em herîne cem me, melayekî me heye, pir zane ye, em jê bipirsin." Radibin diçin cem melayê gund ku pirsa xwe jê bikin. Mela dibêje ku wekî gotina gundî ye. Piştre melayê gund ji zilamê me re dibêje: "Nave te çi ye, tu ji ku derê yî." Hingê hevûdu nas dikin. Diçin rûyê hev û diçin malê. Mela ji birayê xwe re dibêje: "Ma qey tu jî hatibûya hînî ilm bûya wê çima tu biketa vî halî nebaş."

Erê gelî birano, heger me navê em bikevin halê birayê biçûk pêwist e em vê pirsê ji xwe bikin ka em kî ne. Pêwist e em ji bû wî qasî lêkolînê bikin û xwe hînî zanîbûna di hemû waran de bikin.

**NAVXWEŞ EYNÊ**

# NAMEYÊN XWENDEVANAN

## Gaziya Welatê Me

Cerd û pêkûtiya ku îro ji aliyên hêzên tarî ve li ser weşanên welatparêz, sosyalîst û demotrat pêk tên bipergal e. Armanca wan ew e ku dengê gelê kurd û mirovatiyê bifetisînin. Çi feyde "Çala ku ji bo hevalên xwe re dikolin, ew bi xwe dikevinê."

Ji bo têkoşîna gelê kurd bêdeng bikin, rojnameyan bombe dikin, berhev dikin, sansur dikin û hwd. Lê xwedîderketina gelê me û rewşenbîr û hunermendan nîşan da ku tu hêz nikare dengê gelê kurd û aştîxwazan bide birîn. Di demeke wiha girîng de gaziya Welatê Me pir rûmet e. Ji bo nasname û naskirina gelê Kurdistanê çavkaniyeke ronahî ye. Ji rojnameyê hin daxwazên min hene: 1- Ku rojnameya me mîna dibistanekê dersê ziman bide emê zûtir hînî zimanê xwe bibin. (Gramer, rastnivîs û hwd.)

2-Der heqê dîrok û erdnîgariya (cografya) Kurdistanê de rûpelek were amadekirin wê gelek baş bibe.

Silavên şoreşgerî li xebatkar û xwendevanên Welatê Me dikim.

**Özgür Yurdakul/ Mûş**

## Tîraja Welatê Me

Selam! Ez rojnameya me û rojnameya gelê kurd pîroz dikim, di jiyana we ya weşanê de tim û tim serkeftinê dixwazim.

Belê barê rojnameyê giran e. Dibe ku tîraja wê ne pir be, lê ev jî nayê wê wateyê ku kurd rojnameya "Welatê Me" naxwînin. Pir pirsgirêk hene; wekî pirsgirêkên li ber kirîna rojnameyê, nehiştina belavkirinê û nezanîna xwendin û nivîsandinê. Ji ber vê yekê tîraja rojnameyê dibe ku kêm be, lê weşaneke birûmet dimeşîne, tim û tim bi vê qalîteyê divê weşana xwe bidomîne. Beşa falê ne pêwist e, lê beşa xaçepirsê baş e. Hin xwendevan hem rojnameyê dikirin û hem jî bi saya xaçepirsê dibin xwediyê pirtûkên bêhempa.

Silavên xwe yên germ ji hemû xebatkar û berpirsiyarên rojnameya Welatê Me re dişînim.

Roj baş.

**Dilgerm Nemird / Êlih**

## Cih bidin helbestan

Gelî xebatkarên rojnameya Welatê Me! Berî destpêka nivîsandina nameya xwe, silavên xwe yên şoreşgerî ji we re pêşkêş dikim û di pey de derbasî hêvî û daxwaza xwe dibim.

Daxwaza min ji we, hûn dikaribin bi xêra xwe ji me re (ji xwendevanan re) rûpelekî ji bo helbestan bihêlin. Ez bawer im wê xwendevan pir dilşa bibin û wê rojnameya me ji berê pirtir bala xwendevanan bikşîne.

Bila neyê fêmkirin ku ez ji rojnameya bêqusûr re qusûran û kêmasiyan dibînim, na Xwedê şahid e, Welatê Me bêqusûr e. Ez bi saya serê we û bi saya serê xebatkarên rojnameya Welat (ya berê derdiket) ez fêrî kurmanciyeke teze û nivîsandina bi kurdî bûm. Axaftina min a kurmancî berî du sê salan mîna şorbeşîr bû, ji sedî 70 bêjeyên tirkî tê de hebûn, lê îro ne welê ye. We zimanê min bi min da hezkirin. Ez niha helbestan dinivîsim. Kî zane dibe ku di pêşerojê de bi saya serê we emê bi kurdiyeke teze helbestan binivîsînin, bibin mîna Seydayê Cegerxwîn, Dildar, Hişyar, Qedrîcan û hwd. bibin mîna nivîskarekî wek heval Jan Dost.

Daxwazeke min a din jî hûn dikaribin pirtûkên li ser kurd û Kurdistanê, li ser dîrok, wêje, folklor û olên kurdan (olên kevin û ên îro) çapbûyî bi me bidin nasîn û buhayên wan li ser wan binivîsînin, wê pir baş çêbibe. Emê bi çi awayî peyda bikin, hûn wê jî bi xêra xwe bibêjin, hûnê xêreke mezin bi me bikin.

Kekên min, xwişkên min ên hêja! Em bi vî halî jî Welatê Me pir diecibînin. Evên min gotî ne şîret in, hûn karên xwe çêtir dizanin. Bimînin di xweşiyê de.

**Çekdar Yılmaz / Êlih**

## Bingeha dewleta kurd

Gelê Kurdistanê gav bi gav saziyên dewleta xwe ava dike. Dereng be jî, bi kêmasî be jî tevger dike, sererast dike û hîmên rêxistinên sazûmana neteweyî datîne.

Di deh salên dawiyê de, kurdan tirs şikand, başî û nebaşî ji hev derxist, mafê xwe û daxwazên xwe baş fêm kirin. Ev pêşketin û hişyarbûnî li ser hîmê PKK'ê û di dibistana PKK'ê de hatin fêmkirin û ket dilê milyonan.

Ji îro pê ve, ne dijmin û ne jî baweriyên çewt û biyan dikarin van ji dilê milyonan derxin. Êdî her tişt hatiye guhertin. Dijminê kurdan hîn di welatên kurdan de ye. Lê ji mejiyên kurdan derketiye. Lewre kurd ji îro pê ve her tiştî ji bona welatê xwe û mafên xwe dikin. Hetanî doh kesên dibûn muxtar, reîsê belediyeyê û endamê parlamentoyê, dibûn bela serê kurdan. Li dijî gelê kurd biryar û ferman derdixistin.

Gelê me xêzek di ser re kişand. Çawa ku me dost û dijminê xwe nas kirin, nûnerên xwe jî nas kirin. Di van rojan de bersiveke dirokî û biryareke dirokî tê cih. Gelê kurd berpirsiyarên xwe, hêza neteweya xwe, Parlamentoya Kurdistanê ya li Surgunê (mişxeti) ava dike, bingeha dewleta xwe diavêje, hîmên dewleta xwe datîne.

**Ahmet Baraçkılıç**

www.arsivakurd.org



# JI WELATÊ ME

MAZHAR GÜNBAT

## Kurdiya Welatê Me Kurdistanî ye

Heftiya çûyî di vî quncikî de hin bersiv û taybetiyên anketa Welatê Me ya ji bo xwendevanan, hatin pêşkêşkirin. Ji ber tengbûna cih hin niqteyên girîng ên encama anketê man vê heftiyê. Mesela, xwendevanên Welatê Me ji xeynî kurdî bi çi zimanên din dizanin, kêfa wan ji kîjan nivîskaran re tê, çi dixwînin, kîjan aliyê rojnameyê diecibînin an jî qels dibînin û hwd?

Hemû xwendevanên Welatê Me ji xeynî kurdî, an bi tirkî, an bi erebî an jî bi farisî dizanin. Lê ji ber ku ew zimanên dagirkeran in û kurd bi darê zorê ew ziman fêr bûne, ew nakevin nava kategoriya zimanên biyan. Ji xeynî zimanên dagirkeran ji sedî 40'ê xwendevanên me bi zimanekî biyan dizanin. %20 îngilîzî, %15 almanî û %5 jî hin zimanên din (frensî, îtalyanî, yûgoslavî, rûsî, norwecî), %3'yê wan jî bi du zimanên biyan dizanin.

Xwendevanên Welatê Me %97 rojnameya Özgür Ülkeyê dixwînin (dixwendin). %70 Özgür Halkê, %50 Nûbiharê, %40 Rewşenê, %30 Alternatifê, %20 Newrozê, %15 Medya Güneşiyê, %10 Azadiyê, Jiyana Nû, %8 Yeni Yüzyılê, %7 Zülfikarê û bi rêjeyên biçûktir Nûdem, Hevdem, Zend, Cumhuriyet, Milliyetê..

Nivîskarên ku xwendevanên me dixwazin nivîsên wan di Welatê Me de hebin jî li gorî rêjeya xwe ev in: %82 Ali Fırat, %72 Abdurrahman Durre, %69 Yaşar Kaya, %61 Abdülmelik Fırat, %52 İsmail Beşikçi, %34 Yaşar Kemal, %32 A. İnanç, %8 Feqe Huseyn Sagniç, %5 Abdullah Keskin, %5 İsmet İmset, %4 Jan Dost, %3 Jîr Dilovan, %3 Hatip Dicle, %3 Ali Cizreli, %3 M. Can Yüce, Şêrko Bêkes, %2 İsmet Şerif Wanlı, Faik Bulut, Aziz Akreyî, Cemşid Bender, Günay Aslan, Mehmet Uzun, Mehdi Zana, Sabah Kara, Leyla Zana, %1 jî Cemil Gündoğdu, Şefik Beyaz, Recep Maraşlı, Altan Tan, Malmisanij, Mustafa Karasu, Mirhem Yiğit, Yalçın Küçük, A. Kadir Konuk, Münir Ceylan, Celîlê Celîl.

Bi giştî xwendevanên Welatê Me ji zimanê wê re gotine Kurdistanî ye. Ji bo pirsa: "Bi dîtina we zimanê Welatê Me yê kîjan herêmê ye?" Ev bersiv hatine dayîn: %58 Kurdistanî, %22 Botanî, %6 Xerzanî, %4 Serhedî, %3 Amedî, %3 Toran, %2 bêbersiv.

Ji sedî 92'yê xwendevanan zimanê Welatê Me hêsan dibînin, %8 jî dijwar. Li gorî xwendevanan aliyê herî xurt di Welatê Me de hevpeyvîn in, aliyê qels jî nûçe ne. Ji xeynî çend kesan hemû xwendevan dixwazin her tim ferhengok di rojnameyê de hebe û %24'ê wan jî dibêjin bila cihê wê fireh tir be.

Li gorî %75'ê xwendevanên Welatê Me di rojnameyê de zimanê herî hêsan yê Amed Tîgrîs e.

%40'ê xwendevanan di anketê de navên xwe yên rastîn nivîsandine.

%60'ê xwendevanan dixwazin ku em zehftir cih ji nûçeyên der barê şerê azadiyê de biweşînin û rengê hevpar ê hemû xwendevanan welatparêziya wan e.

Profîl û taybetiya xwendevanên Welatê Me bi giştî ev bûn. Nirxandina taybetiyên wan em dîsa dihêlin ji xwendevanan re û tiştê ku emê bikin, demek ji ya din zûtir bicihanîna daxwazên wan e. Li gorî îmkanên xwe emê hemû daxwazên ku bi rêjeyeke mezin hatine pêşkêşkirin, bînin cih. Bimînin di xweşiyê de.

# Rewşenbîrên xwedêgiravî

Ev sê salên min li bajarê Amedê qediyan. Û qederek e hevalên min ên niştimanperwer hene, hin li karistana me û hin jî li derve ji rewşenbîran, heta ku ên nêzan (nexwendî). Dema dibe behsa şoreşa Kurdistanê û şoreşa welatên biyan dibe, ez ji xwe re dibejim: "Kuro lawo ma tu jî tiştekî dizanî?"

Axaftina wan bi tirkî, dibe şildim, bildima wan. Carinan (bi tirkî) dibêjin min: "Çima tu deng nakî, de tu jî tiştekî bêje." Ez jî dibêjim: "Hevalino zikê min bi axaftina vala têr e, di dîroka Kurdistanê de tu car gelê kurd qasî van deh salên buhurî nehatiye bişavtin û guvaştin, di her aliyî de.

Ne dema zirtan e, gelo rojnameya Welatê Me ya vê heftiyê kê kiriye? Özgür Ülke îro kê kiriye? Hûn li mala xwe bi çi zimanî diaxivin? Di mala we de kincên neteweyî hene? (şal, şapik, xakî hwd.) Zarokên we bi kîjan zimanî diaxivin? Hûn bi çi zimanî danûstandinên xwe li dikanan dikin? Armanca Enstitûya Kurdî çi ye, kî nas dike? Gelo CINE–5 li bajarê Şirnexê û hinek navçeyên we ji bo çi serbest û fîlmên porno nîşan dide? Armanca terora spî çi ye û we ew nîşanî zarokên xwe daye? Di malên we de kasetên Yonca Evcimik û Tarkan bêhtir in an berhemên NÇM'ê? Piştî van rexneyan heval carinan aciz dibin û dibejin: "Tu gelekî nîjadperest î û ramana te çewt e belê tu rast dîbejî, lê niha ne dem e." Ez jî dibejim: "Kesên ku piçekî nîjadperestî bi pê re tunebe ne buhayê nîjada xwe dizane ne jî nîjadên biyan nas dike. Em hêj nizanin hevalên ku şerê azadîxwaziyê dikin ji bo çi kar dikin? Kurdistan beyî parastina çand, wêje, dîrok, ziman, tore, govendê ne kesk dibe ne jî zer. Eger em van tiştan neparêzin wê herdem Kurdistan sar be, mîna damiya bêfekî.

**Rêber Ronî**
**Geliyê Goyan/ Şirnex**

# Lawikî Helebce

Be tenya cêy mehêlin
Em şew ziryan deyçênê
Tem û mij daydepoşê
Mangeşew deyrifênê

Gerûy be gizing ter ken
Zamekanî be şîlan
Be goranî daypoşin
Yan be sewzî daristan

Serî be şepolan ken
Ba em şewe rajênê
Balay le hewr bigrin
Brûske û ba deçênê

Be tenya cêy mehêlin
Mindalêkî lasar e
Şar berdebaran deka û
Mang dekat be kolare

Swar e, çi şoreswarê
Espî hetaw zîn dekat
Be goranî û tîşk û maç
Ser zemîn berîn dekat

Ba kejawey le gul bê
Yan le pelkezerîne
Zemawendî xwên degrê
Em şew paşay ewîn e

Aşiqêkî lasar e
Brûske û ba deçênê
Be tenya cêy mehêlin
Mangeşew deyrifênê.

**REFÎQ SABÎR**

*Di hejmara 17'an de me ev helbest weşandibû, lê di dema çapkirinê de jî ber pirsgirêkeke teknîkî rêz tevlîhev bûbûn. Lewma em dîsa diweşînin û lêborîn ji helbestvan û xwendevanan jî dixwazin.*

**Rojnameya Welatê Me**

## FERHENGOK

**Arsim:** Seqem, serma
**Bale:** Debeng, ehmeq
**Bergirî:** Tedbîr
**Berhem:** Eser
**Dadger:** Hakim
**Danişîn:** Rûniştin
**Debeng:** Ehmeq
**Derbirîn:** Îfadekirin
**Dîmen:** Menzere
**Dûrişm:** Slogan
**Goristan:** Qebristan
**Hawirparêz:** Keskparêz (çevreci)
**Hindikahî:** Minorîte (azınlık)
**Hîkarî:** Bandor, tesîr
**Kan:** Jêderk, çavkanî, ocax
**Kevî:** Kêlek, rex
**Lêsiwar:** Erebe
**Menzel:** Ode
**Mirar:** Laşê heywanê sekitî, cinemî
**Navgîn:** Hacet
**Penahende:** Penaber
**Rêpêwan:** Meş
**Rêje:** Nisbet (oran)
**Sirûşt:** Tebîet, xweza
**Teng:** Sêr, sewiye
**Tomerî:** Tevî (toplu)
**Xefik:** Dafik, Kemîn
**Xîm:** Hîm, bingeh


## AGAHIYÊN ABONETIYÊ

**Min Welatê Me Divê**

| | Li Hundir | Li Derve |
|---|---|---|
| ☐ 3 Meh | ☐ 400.000 TL | ☐ 35 DM |
| ☐ 6 Meh | ☐ 800.000 TL | ☐ 70 DM |
| ☐ 12 Meh | ☐ 1.600.000 TL | ☐ 140 DM |

**Bedelê Abonetiyê ez radizînim**

**Li Tirkiyê** – Roza Basın ve Yayın. San.Tic.Ltd.Şti.
Yapı–Kredi Parmakkapı Şubesi
Hesap No: 1100264–1

**Li Derve** – Roza Basın ve Yayın. San.Tic.Ltd.Şti.
Yapı–Kredi Parmakkapı Şubesi
Döviz Tevdiat Hesap No: 3001507–3

**NAV Û PAŞNAV** : ....................................
**NAVNÎŞAN** : ....................................
: ....................................

**Navnîşana Welatê Me**
Ayhan Işık Sok. No:23/3 Beyoğlu/ İST.
**Tel–Fax:** 293 53 19 – 245 29 91



**WELATÊ ME**

Rojnameya Hefteyî
**(Haftalık Gazete)**

Li ser navê
ROZA Basın ve Yayıncılık
San. Tic. Ltd. Şti. adına
Xwedî (Sahibi)
**Aynur BOZKURT**

Gerînendeyê Weşanê
(Yayın Yönetmeni)
**Mazhar GÜNBAT**

Berpirsiyarê Karê Nivîsaran
(Yazıişleri Müdürü)
**Metin AKSOY**

Berpirsiyarê Nûçeyan
(Haber Sorumlusu)
**Suut KILIÇ**

Redaktor
**Sami TAN**

**NAVNÎŞAN (Adres)**
Ayhan Işık Sok. No:23/3
Beyoğlu / İSTANBUL

**TEL–FAX**
293 53 19 – 245 29 91

**ÇAPXANE**
Yeni Asya Matbaacılık A.Ş.

**NÛNERÎ**
(Temsilcilikler)

**Suriye–** Jan Dost
Fener Rojbiyanî
**Berlin–** Silêman Sido
Sîrwan Reşîd
49-30-69 00 26 95
**Bonn–** Ahmet Baraçkılıç
49-228-66 62 49
**Hannover–** Selîm Biçûk
49-5721-813 60
**Hamburg–** A.Hekim Gülsün
49-40-40 33 88
**Munchen–** Mahmut Gergerli
49-871-670 884
**Badenwurttenberg–**
A. Rahîm Ayaz
49-75453258
**Swed–** Amed Tigris
46-8-740 69 81
**Amsterdam–** Cotyar Zaxoy
31-20-613 07 66
**Parîs–** M.S. Ayçiçek
33-1-48000401
**Atina–** Ferhan Zêbarî
30-13634905

